Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL: 1 HEJMAR: 28 | 28 GULAN 1995 | BUHA:40.000 TL(KDVD)

## Sînema ne huner e

Ez dixwazim pirsên ku min ji xwe kirine, temaşevanên min jî ji xwe bikin. Wekî: Çima divê ez bijîm, çima divê ez serê sibe hişyar bibim, çima divê ez bixebitim û piştî mirinê wê çi bibe? Ez dixwazim têmaşevanên min fêm bikin ku ew di tirsên xwe de, di şikên xwe de û di warê hesta ku mirov jiyanê bêkêr dibîne de ne bi tenê ne.

Rûpel 16

## Dax, Hedad û Hesinker

Dema mirov di pêvajoya dîrokê de li peyvên kurdî dinihêre her peyvek xwedî çîrokekê ye. Bê yî vê di tirînca peyvan de têkiliya medeniyeta kurdî û medeniyetên biyan jî derdikeve holê. A rast ew e ku mirov peyvên bingehîn û kevnare bi kar bîne, lewre peyvên bingehîn pir şîrîn in û hezkirina ziman jî li însên zêde dikin.

Rûpel 11

## Emê xwe bişewitînin

Greva birçîbûnê ya malbatan li Stenbolê di navçeyên HADEP'ê Bahçelîevler û Kadiköyê de, bi beşdariya gelek kesan dewam dike. Li hêla din girtiyên ji doza PKK'ê yên ku li Erziromê di grevê de ne, daxuyaniyek weşandin û bal kişandin ser neheqî û kirinên nedemokratîk yên rêveberiya girtîgehê.

Rûpel 4

## Kemal Burkay: Şerê li dijî dagirkeriyê heq e

Li gorî serokê PSKê Kemal Burkay, li Tirkiyeyê pirsgirêkeke kurd heye û her car Tirkiye dixwaze bidê nîşandan ku PKK terorîst e, lê şerê PKK'ê ne yê terorîstiyê ye. Şerê li dijî mêtingehkariyê heq e." Di axaftina xwe de Burkay diyar kir ku avakirina TV MED'ê, serkeftinek e. Burkay got ku ji destê me bihata me yê jî televîzyona kurdî ava bikira.

Rûpel 10

# Wezareta Çandê dijminatiya çanda kurdî dike






### Lîsansên 9 heb fîrmayên muzîkê ku qasetên kurdî derdixistin ji aliyê Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê ve hatin îptalkirin

- Di nav meha gulanê de bi awayekî resmî, Wezareta Çandê lîsansa gelek fîrmayên ku bandên muzîkê çêdikin, îptal kir. Di çapemeniyê de jî gelek caran hate nivîsandin ku li nav hidûdê Walîtiya Herêma Taybet bandên ku bi kurdî ne, tên qedexekirin.

- Navenda Çanda Mezopotamyayê: "Ev qerar, qerareke siyasî ye. Serbestiya zimanê kurdî di gotinê de ma û di pratîkê de qedexeya li ser zimanê kurdî didome. Bandê bi kurdî, piştî van qeraran bi giştî dikevin nav qedexeyê.

- Stran muzîk: "Em wek qerareke siyasî dibînin. Vê qedexeyê jî nîşan da ku li ser navê serbestiyê, qedexe didome. Îro li Kurdistanê şîdet ne tenê li ser mirovan e, li dijî çand û hûnera kurdî ye jî.

Rûpel 2


### Ji Berpirsiyarên MED'ê Ahmet Akkaya:

# 'Ne tenê kurd neteweyên din jî li MED'ê temaşe dikin

- Li gorî ku em agahdar in ne bi tenê kurd, belê tirk û neteweyên din jî li TV–MED'ê temaşe dikin. Herwiha em ji xelkê dibihîzin û ji rojnameyên mîna Welatê Me dixwînin ku di nava temaşevanên me de cerdevan jî hene.

- TV– MED'ê dê cih bide hemû pirs, dabaş û temayên perwerdekariyê, pirsên edebî, kulturî, siyasî û dîplomatîk, dê cih bide hemû pirsên jinan, zarok û ciwanan, pirsên ziman û zaravayên siyasî û pirsên penaber û derketiyên li derveyî welêt û bi taybetî kurdên li Sovyeta berê.

Rûpel 8–9




**JI ROJEVÊ**

# CUDAXWAZ KÎ NE?

**Di nav meha gulanê de bi awayekî resmî, Wezareta Çandê lîsansa gelek fîrmayên ku kasetên muzîkê çêdikin, îptal kir. Dikare bê gotin ku saziyeke dewletê (Wezareta Çandê) li gorî siyaseta dewletê ya giştî, dixwaze bi awayên veşartî û resmî, zimanê kurdî di pratîkê de qedexe bike. Li Tirkiyeyê gava qala mafên kurdan û zilma ku li ser wan tê kirin, em berpirsiyarên dewletê deynin aliyekî gelek siyasetvan, ronakbîr û rojnamevanên tirk îdia dikin ku ji aliyê hemwelatîbûnê ve tu ferq di navbera kurd û tirkan de tune. Hinek ji wan dibêjin, "ka ji me re bibêjin heta vê gavê çi astengî li hemberî kurdan derketine, Kê kengî muzîk û çanda kurdî qedexe kiriye, hûn dikarin mînakekê bidin?" Bêguman ev pirseke pir komîk e. Ji ber ku bêhejmar mînakên neheqî, rêlibergirtin, astengî û ferqûmêliyê hene. Nûçeya di rojeva me de yek ji wan mînakan nîşan dide. Ev mînakan, belkî ji sedî ne yek be jî.**

Lîsansên 9 şirketên ku kasetên kurdî derdixin, ji aliyê Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê ve hate îptalkirin

# Wezareta Çandê dijminatiya çanda kurdî dike


T.C.
KÜLTÜR BAKANLIĞI
TELİF HAKLARI VE SİNEMA GENEL MÜDÜRLÜĞÜ

Sayı : B.16.0.THS.0.TEL.00.04.680/-4066
Konu: Eser işletme belgesi iptali

ANKARA
24 EKİM 1994

STRAN MÜH.REK.VE ORG.TİC.LTD.ŞTİ.
Guruba Hüseyin ağa Mah. Dağarcık Sok. No:22/2
Fatih/İSTANBUL

Çeşitli illerde mülki idare amirlerince yapılan fiziki denetimlerde elde edilen kasetlerden firmanıza ait "HEVÎ (UMUT), ŞER (KAVGA), EM AZADİXWAZIN VE MAMOSTA" adlı ses kasetleri Valiliğin yetki ve görev sınırları içerisinde 3257 sayılı yasanın 9. maddesi doğrultusunda yasaklanmış, sözkonusu kasetler İçişleri Bakanlığı- Emniyet Genel Müdürlüğü kanalıyla suç duyurusu ile incelenmesi ve gereğinin yapılması için Bakanlığımıza gönderilmiştir.

Anılan kasetler, Türkçe çözümleri ve kasetlerin arşiv dosyası Alt Komisyona verilmiş olup, Alt Komisyonca Denetleme Kuruluna havale edilmiştir. Denetleme Kurulunca hazırlanan gerekçeli rapor ile Sinema ve Müzik Eserlerinin Denetlenmesi Hakkında Yönetmelik'in 9. maddesi gereğince eserlerinizin dağıtılması ve yayınlanmasının uygun olmadığına karar verilmiştir.

Karar doğrultusunda "HEVÎ (UMUT), ŞER (KAVGA), EM AZADİXWAZIN VE MAMOSTA" adlı eserlerinizin işletme belgesi iptal edilerek bandrol verilmesi durdurulmuştur.

Bilgilerinizi rica ederim.

İhsan YÜCEÖZSOY
Genel Müdür


T.C.
KÜLTÜR BAKANLIĞI
TELİF HAKLARI VE SİNEMA GENEL MÜDÜRLÜĞÜ

Sayı : B.16.0.THS.0.TEL.00.04.680- 8 ? ?
Konu: Eser İşletme Belgeleri ve Yapımcı Belgesi iptali

ANKARA
... NİSAN 19..

MAZLUM PLAK VE KASETÇİLİK PAZ.LTD.ŞTİ.
İMÇ 6 Blok No:6525
Unkapanı/İSTANBUL

Mülki İdare Amirliklerince yapılan fiziki denetimlerde elde edilen kasetlerden firmanıza ait Derabın (Haydi Kalkın) ve Derabın (Velat Şirini) Nevroz (Kalkın Gidelim Guzel Nevruza) adlı ses kasetleri valiliğin yetki ve görev sınırları içerisinde 3257 sayılı Yasanın 9. maddesi doğrultusunda yasaklanmış, sözkonusu kasetler İçişleri Bakanlığı-Emniyet Genel Müdürlüğü kanalıyla suç duyurusu ile incelenmesi ve gereğinin yapılması için Bakanlığımıza gönderilmiştir.

Anılan kasetler Türkçe çözümleri ile kasetlerin arşiv dosyası Alt Komisyona verilmiş olup, Alt Komisyonca Denetleme Kuruluna havale edilmiştir. Denetleme Kurulunca hazırlanan gerekçeli rapor ile Sinema ve Müzik Eserlerinin Denetlenmesi Hakkındaki Yönetmelik'in 9. maddesi gereğince eserlerinizin, dağıtılması ve yayınlanmasının uygun olmadığına karar verilmiştir.

Karar doğrultusunda Derabın (Haydi Kalkın) ve Derabın (Velat Şirini) Nevroz (Kalkın Gidelim Güzel Nevruza) adlı eserlerinizin işletme belgesi iptal edilerek bu eserlere bandrol verilmesi durdurulmuştur.

Ayrıca, sözkonusu eserleri beyana ve aslına uygun olmayan şekilde çoğaltırarak dağıttığı ve piyasaya arzettiği için Sinema, Video ve Müzik Eserleri Yapımcıları ile Film Çekmek İsteyen Yabancılar ve Yabancılarla Yapılacak Ortak Yapımlar Hakkında Yönetmelik'in 3. maddesi 2. paragrafına istinaden Bakanlığımızca daha önce uyarılmış olan firmanızın bu defa yapımcı belgesinin iptali cihetine gidilmiştir.

Bilgileriniz ve tahsis edilen yapımcı belgesinin Bakanlığımıza en kısa zamanda iadesini önemle rica ederim.

İhsan YÜCEÖZSOY
Genel Müdür

**Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê bi belgeyên wiha lîsansa qasetçêkirinê ya fîrmayan îptal dike.**

Piştî pest û qedexeyên li ser çand, huner û zimanê kurdî dewletê dest avêt stranên kurdî jî. Di serê meha gulanê de Wezareta Çandê lîsansa kasetçêkirinê ya 9 firmayên ku bi kurdî kasetan çêdikin, îptal kir. Wezareta Çandê, berî niha bi demekê lisansa kasetçêkirina firma û saziyên Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM), Stran, Mazlum, Filiz Oğuz, Özdemir, Diyar, Ataman, Sefkan û Kaya îptal kir.

Di çapemeniyê de jî gelek caran hate nivîsandin ku li nav hidûdê Walîtiya Herêma Taybet kasetên ku bi kurdî ne, tên qedexekirin.

Li ser vê mijarê me fikrên nûnerên firmayan stand û ji me re gotin ku ev demeke dirêj e ku em ji her aliyî ve di bin pest û cerdan de ne û gelek car jî ji aliyê rayedarên dewletê ve em hatine îkazkirin.

Nûnerên firmayan, li ser astengî û pestên di vî warî de ev gotin: "Dema em kasetekê çêdikin, lazim e em ji bo wê, dosyayekê jî amade bikin û vê dosyayê bidin Muduriyeta Kulturê ya Bajêr. Em di vê dosyayê de stranên bi kurdî werdigerînin tirkî. Heyeta muduriyetê, li ser gotinên ku di kasetê de hene, lêkolînê çêdike û hin staranan bi şûnde vedigerîne (yanî ev heyet wekî heyeta sansurê kar dike). Piştre jî destûr dide ku em kasetê derxin û bidin piyaseyê. Zehmetiyên me yên herî mezin jî piştî destûrê di belavkirin û firotinê de dertên pêşiya me. Piyaseya kasetê kurdî ji xwe kifş e. Em bi giranî xîtabî kurdan dikin. Lê, li bajarê Kurdistanê bi şiklekî eşkere kasetê bi kurdî qedexe ne. Bayî newêrin kasetên bi kurdî bifiroşin. Polîs li dikanên kasetfiroşan bela sebeb dest datînin ser kasetên bi kurdî. Gelek caran jî kasetan di rê de berhev dikin an jî di cih de dişewitînin. Minakê van bûyeran gelek in."

**Prosedura qanûnan çawa tê bikaranîn?**

Der barê prosedura qanûna kasetçêkirinê de jî nûnerên firmayan ev gotin: "Dema ji bo kasetekê dewlet doz vedike, wergera kasetê polîs dikin û mehkeme jî wergera wan esas digirin. Dozger ji madeya 9'an a qanuna 3257'an doz vedike û salek heps û 41 milyon jî cezayê pere dixwaze. Û doz di DED'ê de tê dîtin, ji ber ku di nav madeyê de sûcdariya cudaxwaziyê heye. Lê gelo, ji aliyê ewlehiya dozê ve, wergera polîsan çiqas rast e? Me, ji mehkemeyê daxwaz kir ku bila werger ji aliyê "Enstituya Kurdî" ve bê kirin."

Nûneran, di dawiya axaftina xwe de jî gotin: "Lisansa kasetçêkirina me, li gorî nîzamnameya der barê çêkerên bernamên sînema û muzîkê û kesên dixwazin bi xerîban re bi şirîkahî fîlman bikişînin, ji ber xalên 3'yan, pragrafa 2'yan hatiye îptalkirin. Lê, emê di her şert û mercî de karê xwe bidomînin, li zimanê xwe xwedî derkevin û biparêzin. Em bawer in ku bi alikariya gelê xwe emê bi awayekî serkeftî ji van astengan xelas bibin."

**Fîrmayan çi got?**

Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM): "Ev qerar qerareke siyasî ye. Serbestiya zimanê kurdî di gotinê de ma û di pratîkê de qedexeya ziman didome. Kasetên bi kurdî, piştî van qeraran bi giştî dikevin nav qedexeyê. Ev bi xwe re qedexeya zimanê kurdî tîne û di pratîkê de ziman tê qedexekirin. Emê xebatên xwe dîsa bidomînin û kasetan amade bikin. Ji bo pêşveçûna çand, huner û zimanê kurdî çi xebat lazim be, emê bikin û di her merc û şertî de karê xwe bidomînin bidomînin.

Stran muzîk: "Em wek qerareke siyasî dibînin. Vê qedexê jî nîşan da ku li ser navê serbestiyê, qedexe didome. Îro li Kurdistanê şîdet ne tenê li ser mirovan e. Şîdet li dijî çand û hûnera kurdî jî heye. Qedexê nîşan da ku zimanê kurdî tu car serbest nebûye. Gerînendeyê me yê giştî Kemal Yüksel û hevalekî me li ser kasetan, ji madeya 9'an a qanuna 3257'an yê sînema û muzîkê, salek heps û 41 milyon cezayê pere standin. Lê, emê li hember tehrîba çand û hunera xwe bisekinin û di her şertî de biparêzin."


**Kasetên qedexekirî**

Heta vê gavê bi dehan kasetên bi kurdî hatine qedexekirin. Lê tiştekî balkêş heye ku ew jî Wezareta Çandê tu ferq nexistiye nav kasetan. Bi gotineke din, çi siyasî, çi folklorî û çi jî kulturî, her cur kasetên bi kurdî bûye hedefa Wezaretê Çandê. Em navê çend kasetên ku ji aliyê Wezaretê hatine qedexekirin, ku di nav wan de her cur kaset hene, li jêr rêz dikin:

Kulîlka Azadî (Koma Amed), Newroz (Aramê Tîgran), Ehmedo Ronî (Stranên Gelêrî-I), Helbestên Bijarte (Koma Berxwedan), Ferzê (Şivan Perwer), Rozerîn (Koma Çiya), Sorgula Min (Şehrîbana Kurdî), Gorî Gorî (Emînê Erbanî), Rêzan (Koma Şîrvan), Hêvî (Koma Dengê Azadî), Aydınlığım (Nîzamettin Ariç) û hwd...

**ÎSMET ÛSIF**

## Zübeyir Aydar Parlementoya Ewrûpayê ziyaret kir



Serokê Konseya Kargeriyê ya Parlementoya Kurdistanê li Derveyî Welêt (PKD) Zübeyir Aydar, di 23'ê gulanê de bi alîkarê serokê Parlementoya Ewrûpa Renzo Imbeni re hevdîtinek çêkir. Di hevdîtina ku zêdeyî saetekê dewam kir de bi giranî li ser çareserkirina siyasî ya pirsgirêka kurdî hate sekinîn.


Heyeta PKD'ê di hevdîtinê de pêşniyarên xwe yên li ser çareseriya pirsgirêkê anîn zimên. Alîkarê serokê Parlementoya Ewrûpa Renzo Imbeni jî di hevdhitinê de diyar kir ku ew dostekî kurdan e. Renzo Imbeni, li ser daxwaza ketina Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewrûpayê jî ev got: "Bila Tirkiye zanibe ku heta ew nebe dewleteke demokratîk û mebûsê DEP'ê (Partiya Demokrasî) bernede, ketina nava Yekîtiya Ewrûpayê ne mimkûn e."

**KURD-A**

www.arsivakurd.org

## JÛJÎ

Doğan Güzel




Ji Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan banga aştiyê:


# 'Em amade ne ji bo ku şer bisekine'

Ajansa nûçeyan Reutersê li geliyê Bekaa bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevpeyvînek pêk anî. Di hevpeyvînê de Öcalan da zanîn ku amadekariyên wan ya hilperînê havînan gihîştiye pileya herî bilind, ji bo ku vê havînê xwîn hîn zêde nerije, heke artêşa tirk operasyonên xwe yên jiholêrakirinê bide sekinandin û ji çareseriya siyasî re amade be, ew jî amade ne ku şer bisekinînin û bi dewleta tirk re ji bo çareseriya siyasî rûnin. Serokê PKK'ê Öcalan got ku heke dewleta tirk bi ser gelê kurd ve biçe, wê gelê kurd jî şer gurtir bike. Wî got ku dewleta tirk nikare pirsgirêka kurdî bi riya leşkerî hel bike.

Li ser pirseke peyamhinêr a der barê şerê giştî û livbaziyên li warên turîstîk de Öcalan wiha got:" Ji ber ku dewleta tirk li hemberî me şerê giştî îlan kiriye, em jî li hemberî wê şerê giştî dimeşînin. Mebesta şerê me rûxandina bingeha aboriya Tirkiyeyê ye. Em dixwazin bi dinyayê bidin nîşan ku li Tirkiyeyê şer heye û ew der ne cihê ku turîst biçinê ye." Öcalan got ku dewleta tirk aboriya Kurdistanê, heta mal û heywanan dirûxîne, destûrê nade ku kurd navên bi kurdî li zarokên xwe bikin.

Serokê PKK'ê îşxala Başûr wekî têkçûneke artêşa tirk bi nav kir û got ku dewleta tirk zayîata xwe vedişêre, ya gerîla zêde nîşan dide. Li gorî Öcalan zayîata artêşa tirk ne kêmî 800 leşkerî ye, lê aliyê din zayîata gerîla li dora 60'î ye. Abdullah Öcalan rexneyan li PDK'ê digire dibêje ku PDK'ê di îşxalê de aliyakariya artêşa tirk kiriye. Ew dide zanîn ku PDK nikare sînor kontrol bike û divê Mesud Barzanî neyê xapa dewleta tirk.

Nivîskarê ajansê Haitham Haddadin ku hevpeyvîn çêkiriye di çavdêriyên xwe de dide zanîn ku hevpeyvîn di mercên dijwar de çêbûye, li ser sedema wê yekê jî Öcalan gotiye ku pesta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li ser Îran û Suriyeyê heye da ku alîkariyê nedin PKK'ê. Nivîskar axivîna Öcalan bi



tirkî wekî kêmasiyeke dinirxîne. Banga Öcalan li ser raya giştî ya dinyayê ban- doreke baş hişt, lê dewleta tirk ev bang jî red kir.

**Navenda Nûçeyan**

# PKD: 'Bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin û pê bifikirin'

Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt di gelek şaxan de, xebatê dike û dixwaze gavên yekemîn ji bo avakirina dezgehên neteweyî bavêje û li nirxên neteweyî xwedî derkeve. Vê xebatê ji xwe re wekî wezîfeyeke esasî dinase.

Berpirsiyarê Kar û Barên Çandî yê di Parlementoya Kurdistanê de Maşallah Öztürk bi vê mebestê daxuyaniyek da TV–MED'ê.

Di daxuyaniyên xwe de Öztürk diyar kir ku wê di mehên pêşiya me de, bi îhtimaleke mezin di meha pûşperê (hezîran) de kampanyaya zimanê kurdî were vekirin. Armanca vê kampanyayê ew e ku, kurd bi zimanê xwe bixwînin, binivîsînin û bi zimanê xwe bifikirin. Her wiha Öztürk got: Heta niha hemû nirxên me yên neteweyî bindest û bendkirî bûn û îmkan tune bûn ku ev hêjayî bi pêş bikevin.

Tevgera Rizgariya Kurdistanê, ku ji her alî ve bi pêş ve diçe, îmkan peyda kirin ku ev xebat jî xurt bibe û ji bo çand û kulturê jî rê û derfetên nû werin holê û peyda bibin.

Weke tê zanîn di sala 1994'an meha pûşperê de li Mastrîxê, di Konferansa Çand û Hunera Kurdî de, biryar hatibû standin ku sala 1995'an bibe sala Ehmedê Xanî. Ev çalakî bêhtir ji bo bîranîna vê salê têne çêkirin.

**Navenda Nûçeyan**

## ...KURTENÛÇE...

### Li Kurdistanê "gundên stratejîk"

Piştî şewitandina gundan dewletê dest bi avakirina "gundên stratejîk, kir. Li gorî agahiyan Kurd–A'yê, hêzên dewletê piştî valakirina gundan bi zorê belgeya "Em ji PKK'ê reviyan" bi gundiyan dide îmze kirin. Gundên dora Çelê, Libiş û Jiyaniş hatine valakirin û gundî li gundê Diyarî hatine bicihkirin. Dîsa gundê Şûke û Bûre hatine valakirin û gundî li gundê Ertuşê, hatine bicihkirin.

**KURD–A**

### Li Almanya "Mala Êzîdiyan"

Di 21'ê gulanê de, li Krefelda Almanyayê "Mala Êzîdiyan" bi pîrozbahiyekê vebû. Zêdeyî 200 kesî di pîrozbahiyê de cih girtin û di pîrozbahiyê de Koma Zerdûşt û hin komên çandî jî hebûn. Di axaftina li ser navê komeleyê de hate gotin ku Mala Êzîdiyan wê girêdayî hêjahiyên neteweyî, xebatan bike û deriyê wê ji hemû Kurdistanî û êzîdiyan re vekiriye. Armanca komeleyê ew e ku li hemû welatên Ewrûpayê şaxên xwe veke.

**KURD–A**

### Pêşbaziya ji bo amblema PKD'ê

Dîwana Serokatiya Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt, roja 19'ê gulanê bi serokatiya Yaşar Kaya civiya. Dîvanê xebatên parlementoyê yê ji 12'ê avrêlê bi vir ve hate nirxandin û biryar hatin standin. Dîsa li ser avahiya parlementoyê, butçe û hin mijarên teknîkî jî hate sekinîn û ji bo amblema PKD'ê jî biryara pêşbaziyê hate standin.

**KURD–A**

### Artêşa tirk dîsa kete Başûr

Di 22'ê gulanê de artêşa tirk bi hêzeke nêzîkî 10 hezarî li hin deveran nêzîkî 5 km kete erdê başûrê Kurdistanê. Li gorî BBC'yê leşker li dora gundê Görümlü, Çalıkan û warê Hamamboğozı dixwazin operasyon bikin. Tê zanîn ku beriya demekê artêşa tirk ji başûrê Kurdistanê vekişiyabû. Û li gorî Ajansa Kurd–A'yê jî di operasyonê de nêzîkî 800–900 leşker û 120–130 gerîla miribûn.

**KURD–A**

### Li Çelê heft cerdevan mirin

Gerîlayên ARGK'ê roja 20'ê gulanê êrîşî qereqola sînor a 49'an ku li ser Çelê ye kirin. Di êrîşa gerîlayan de 2 leşker mirin gelek leşker jî birîndar bûn. Dîsa eynî rojê gerîlayan li Behdînanê, cerdevanên Gerdiya yên gundên Benuta û Kemanê xistin kemîna xwe. Di kemîna gerîlayan de 7 cerdevan mirin û nêzîkî 10 cerdevan birîndar bûn.

**KURD–A**

Navên **5** kesên ku di xaçepirsa hejmara 26'an de peyva veşarî **'Heyranok'** dîtine û pirtûka **"Qaqlîbaz"** qezenc kirine:

Cemil Bilgiç
Edirne

**Alican Korkmaz**
**Amed**

İhsan Taş
Stenbol

**Remzi Kalhanlı**
**Ruha**

Zeki Bazidi
Agirî

# Dayikên girtiyan: Emê xwe bişewitînin

Malbatên girtiyan dan zanîn ku heger dewlet rê li ber zilm û zora ku li ser girtiyan çêdibe negire, ewê xwe bişewitînin.

Malbatan, ji bo piştgiriya girtiyên li girtîgeha Erziromê, di 16'ê vê mehê de li Stenbolê dest bi greveke birçîbûnê kirin.

Li gorî gotina malbatên girtiyan, wezîrê dewletê Algan Hacaloğlu yê ku ji mafên mirovan berpirsiyar e, soz daye wan û gotiye: "Emê di demeke kurt de êrîşên li ser girtiyan bidin sekinandin." Lê wî gotina xwe neaniye cih.

Der barê sersariya rayedarên dewletê de jî malbatan ev daxuyanî dan: "Çi ji destê me bê emê bikin, ji aliyekî ve mitîng û rojiya mirinê û ji aliyê din ve jî ji bo protestokirina dewletê emê xwe li metropolan bişewitînin."

Di daxuyaniya malbatan de tê gotin ku ew ji bo çûna Erzromê û li pêş girtîgehê ketina greva birçîbûne jî haziriyê dikin.

Greva birçîbûnê ya malbatan li Stenbolê di navçeyên HADEP'ê yên Bahçelîevler û Kadiköyê de, bi beşdariya gelek kesan dewam dike.

Li hêla din girtiyên ji doza PKK'ê yên ku li Erziromê di grevê de ne, daxuyaniyek weşandin û bal kişandin ser neheqî û kirinên nedemokratîk yên rêveberiya girtîgehê. Li gorî daxuyaniyê, ji bo ku ew bibin îtirafkar, zilmeke dijwar li wan tê kirin. Tê gotin ku îşkence û zilma dewletê ya niha, ji dema derbeya 12'ê Îlonê ne kêmtir e.

**Li Êlihê greva birçîbûnê qediya**

Li Girtîgeha Êlihê greva birçîbûnê ku ji 5'ê avrêlê vir ve dewam dikir bi peymanê hate qedandin. Lêzimên girtiyan ku di avahiya HADEP'a Êlihê de dest bi greva birçîbûnê kiribûn jî dawî li greva xwe anîn.

Di 19'ê avrêlê de bi navbertiya Komeleya Mafên Mirovan rayedarên girtîgehê û nûnerên girtiyan li ser daxwazan li hev hatin û girtiyan dev ji rojiya mirinê berdan. Li gorî peymanê 28 daxwazên girtiyan hatin qebûlkirin. Tê zanîn ku greva birçîbûnê li dijî pest û cerdan di 5'ê avrêlê de dest pê kiribû û girtiyan grev di 1'ê gulanê de qulibandibûn rojiya mirinê.

Hin daxwazên girtiyan yên hatine qebûlkirin:

1–Nûnerê girtîgehê (xwedî maf e ku here hemû qawîşan)

2–Serbestbûna çûn–hatina di navbera qawîşan de

3–Rabûna sînorên li ber pirtûk û weşanan

4–Di çûyîn û hatine dadgeh û nexweşxaneyê de sekinandina îşkence û haqaretan û hwd.

**Navenda Nûçeyan**




**Malbatên girtiyan jî li HADEP'an di greva birçîbûnê de ne.**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (26)




## XAÇEPIRSA BIXELAT (28)




Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê li 10 kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 28'an; kaseta **" Şemal"** e. Ev kaset ji aliyê **Koma Azad** ve hatiye dagirtin û berhemeke Navenda Çanda Mezopotamyayê ye.

**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.


**Xelata Xaçepirsê**




**"Şemal"**
KOMA AZAD

Nivîskar û romannivîs îngiliz Hanif Kureishi:

# Dîn kete dewsa komunîzmê



Kovara Newsweek di hejmara xwe ya 29'ê gulanê de li ser rewşa misilmanên Ewrûpayê disekine. Di nava vê nivîsara berfireh de hevpeyvîna bi nivîskarê Îngiliz Hanif Kureishi re ku li xortên misilman yên li kolejên Îngilistanê disekine jî, heye. Kureishiyê ku di pirtûka xwe ya dawî de li ser wan disekine, dibêje ku niha bi hilweşîna sîstema sosyalîst ol ketiye dewsa komunîzmê. Her wiha Kureishi di nav biyanan de xurtbûna bandora îslamê bi sedemên nîjadî ve girêdide. Li gorî gotina wî ew dînê îslam ji sedî sed wekî malê xwe dibînin, bi riya ol mirov xwe ji problemên civakî diparêzin. Kureishi li ser xwendekarên misilman wiha dibêje: "Ol hesta piştgiriyê û hêviyê dide wan zarokan. Ev xort li kolejê dixwînin, lê bawer nakin ku ewê kar bi dest bixin. Ew bawer dikin ku karsazî bi destê çermspiyan tê meşandin, karê li supermarketan tenê wê bi dest asyayî reşikan bikeve."

Nivîskarê îngiliz li ser helwesta wan ciwanan a li hemberî rojavayiyan jî dibêje ku piştî tiştên ku mêtingehkariyê anîne serê wan, ew li hemberî Rojava rikdar in. Ew dibêje ku xort di gira xwe de ferqê naxin nava rojavayiyan, gişkan wekî hev dibînin.

Kureishi dide zanîn ku hinek ji van qet hez ji mizgeftê nakin û giramgiriya wan li hemberî meleyan nîn e. Hanif Kureşi bala dikişîne ser nakokiya di navbera van de û rewşa wan dişibîne ya troçkîstên berê.

Nivîskarê ku bi xwe jî melez e, dibêje ku di dema xwendekariya van de xwendekar pir–hindik çepgir bûne û bişik li bûyeran nihêrtine, lê niha xortên oldar bi baweriyeke bêşik girêdayî ol in. Kureishi dibêje: "Tiştê ku zehf ez şaşwaz hiştim û êşandim ev bû ku van xortan qet li xwe nedifikirin û Rojava bi giştî red dikirin.

Li gorî agahiyan 1.3 milyon misilman li Îngilistanê dijîn, hinekên van di nava Partiya Karker a Îngiliz de xebatê dikin, lê polîtîkayên lîberal yên partiyê dilê wan jê sar dike. Ji ber ku ew dizanin ku nikarin bi partiyeke misilman sîstema du–partî ya îngiliz biguherînin, giraniyê didin xebatên li dibistanan.

**Nûçeyên Derve**



Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî:

# Polîsên alman zilmê li biyanan dikin

Li gorî nûçeyeke ku rojnameya The European heftiya çûyî (19–25 gulanê) da, Rêxistina Efûyê ya Navnetewî tewra polîsên alman a li hemberî biyanan rexne dike. Rojname dide zanîn ku Rêxistina Efûyê li paytexta Almanyayê raporek weşandiye û di wê raporê de kirinên polîsên almanî yên li dijî mirovên biyan tên rexnekirin. Di raporê de tê gotin ku mirovên biyan ji polîsan parastina canê xwe hêvî dikin, lê ji wan kulm û pihînan dixwin.

Rapor dibêje ku hejmara kirinên zilimkar yên polîsan ne hindik e û bi dem û cihan ne sînorkirî ye. Rêxistina Efûyê di rapora xwe de rexneyan li hikûmeta alman jî digire. Tê gotin ku hikûmetê ev bûyer wekî problemekê qebûl nekirine û ji bo eşkerekirina van kirinan xebat nekiriye.

Di raporê de tê gotin ku kirinên dij–mirovî bi piranî li mirovên biyan, penaber û kesên ji hindikahiyan tên kirin. Bi awayê ku rapor dibêje, tevî zêdebûna rêjeya nijadperestan ku piştî yekitiya du Almanyayan pêk hat, ev kirinên polîsan mirovan hîn pirtir dixin nava endîşeyê.

Wekî tê zanîn polîsên di meş û xwepêşdanan de bi hovitî êrîşî beşdaran dikin. Dîsa gelek êrîşên bi wî rengî li dijî kurdan pêk hatine û hîn jî tên.

**Nûçeyên Derve**

# Dudayev plana aştiyê amade dike

Li Çeçenîstanê şerê ku di berfanbara 1994'an de dest pê kir, niha li çiyayê başûrê welêt didome. Agirbesta ku du hefteyan berî niha ji aliyê Rûsyayê ve hatibû îlankirin ji aliyê çeçenan ve nehat nasîn û şer dewam kir.

Niha tê gotin ku Serokê Çeçenîstanê Dzokhar Dudayev planeke aştiyê amade dike. Berdevkê çeçenan Movladi Udugov ji cihekî nediyar telefonî ajansa Reutersê kir û daxuyand ku Dudayev li ser planeke aştiyê dixebite, lê Udugov zêde agahî nedan.

Li aliyê din ajansa Inter–faksê da zanîn ku rayedarên çeçen gotine ewê li ser detayên planê di demeke kin de agahiyê bidin ku tê de mercên agirbestê û çareseriya siyasî cih digirin.

Her çiqas Serokê Rûsyayê Boris Yeltsin û Wezîrê Parêziyê Pavel Grachev daxuyandibûn ku ji bo sekinîna şer çekdanîna çeçanan pêwist e jî, li gorî agahiyên ajansa Itar–Tassê Boris Yeltsin jî ferman daye Serokwezîr Viktor Chernomydin ku li riyeke çareseriya siyasî bigere.

**Nûçeyên Derve**



**Boris Yeltsin**



**Dzokhar Dudayev**

# Gerry Adams û wezîrê îngiliz li hev rûniştin

Serokê Partiya Sinn Feinê û Wezîrê Karê Îrlandaya Bakur Sir Patrick Mayhew li paytexta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hevdîtinek pêk anîn. Serokê Sinn Feinê û wezîrê hikûmeta îngiliz ji bo civîneke li ser aboriyê çûbûn Washingtonê, li wir di navbera her du aliyan de hevdîtinek pêk hat. Di pêvajoya 23 salan de ev cara yekemîn e ku hevdîtineke evqas payebilind di navbera her du aliyan bi awayekî eşkere pêk tê. Her çiqas ev hevdîtin neresmî be jî, derdorên siyasî didin zanîn ku ev hevdîtin wê rûmeta Sinn Feinê li qada navneteweyî zêdetir bike.

# Bi hezaran baskî serxwebûn xwest

Li bajarê Sen Sebastiyanê bi hezaran baskî, li ser banga partiya serxwebûnxwaz Herri Batasuna roja 22'ê gulanê xwepêşdanek li dar xistin. Beşdaran bi sloganên xwe piştgiriya ETA'yê kirin û serxwebûn xwestin. Hin rêxisitinan ji bo berdana kazsazê baskî Jose Maria Aldaya Echeverria banga xwepêşdaneke li dijî ETA'yê kiribûn, serxwebûnxwazên baskî li hemberî wê bangê ev livbaziya girseyî pêk anîn. Li gorî îdiayan karsaz ji aliyê ETA'yê ve hatiye revandin. Lê ETA'yê heta niha berpirsiyariya vî karî hilnegirtiye ser xwe.



www.arsivakurd.org

# FAL

**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Li her derê hûn fikra xwe bêtirs dibêjin, ev tiştekî baş e. Lê hin caran hûn xwe tevî şerê xelkê dikin, ji bo ku hûn zirarê nebînin divê hûn xwe hînî alînegirtinê bikin û têkilî şerê xelkê nebin. Lewre serê navberçiyan tê şikandin.

**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Hûn naxwazin kes têkilî we bibe û her gav xwe li quncikekî vedişêrin. Qîma we bi gotina, "Keda helal mû be naqete, keda heram ku weris be diqete" tê. Lewma hûn bi dil û can xwe didin karê xwe. Xwe ji mirovên xapînok biparêzin.

**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Hûn pir bilez dipeyivin, lê qet gotina xwe dubare nakin. Ew helwesta we hevalên we dixe nava tengasiyeke bêhempa. Dibe ku gotina rast li we xweş neyê, lê hûnê rojekê bibin sedema sergêjiyên mezin.

**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tirmeh)**

Dilê we bi xelkê dişewite, lê hin caran nezaniya wan we pir aciz dike, rast e du parên nezaniyê ji ber xizaniyê ye. Dîsa jî ji bîr nekin ku îmkanên zanînê ji mirovên xizan pir dûr in. Ji xwe re eynikeke biçûk bikirin.

**ŞÊR (24 Tirmeh - 23 Gelawêj)**

Hûn her tim emiran didin derdora xwe, mirov bi vê kirina we pir diêşin û ji we bi dûr dikevin. Tê gotin ku teyr bi refê xwe re, mirov bi koma xwe re, lewma ji hevalan lêborîna xwe bixwazin. Nexwe hûnê tik û tenê bimînin.

**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Wisa tê dîtin ku hûn hez ji geremolê nakin. Hûn di nava birek mirov de kesekî/e an du kesan diniqînin û dixwazin ku bi wan re bibin hevalên jidil. Zehf rika mirovan diçe ser we; ba li dîwarê derve dixe, hay ji xwe hebin.

**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Baweriya we bi xelkê tê. Piştî ku we bi gotina xelkê kir, gotina pêşiyan, "Bi dinyayê bişêwirin, lê dîsa bi ya xwe bikin" tê bîra we, lê hûn hew dikarin tiştekî bikin. Divê hûn vê gotinê ji xwe re bikin guhar.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Quretî û pozbilindiya we pir bi navûdeng e, lê navdayîna xerab belayên mezin tînin serê mirov. Heke hûn li vê rewşê neverqilin, wê ji we re jî bibêjin, "Bilind firî, nizim ket." Girîngiyê bidin derdora xwe.

**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Hûn zêde li encama gotin û kirinên xwe nafikirin. Baş e ku hevalên we hez ji we dikin û zêde bi gotinên we naêşin. Dîsa jî pir pê de neçin, hinekî bipîvan hereket bikin. Nexwe seriyê birî, nayê kirîn.

**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Di navbera gotin û kirinê de çiya hene, lewma daxwazên we pêk nayên. Hûn her gav ji hevalekî/e xwe tiştekî dixwazin, lê pir baş e ku ew pirî caran sozên xwe nayinin cih, heke ne wisa bûya, wê malikwêran bibûna.

**DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Hûn li ser soza xwe disekinin, ji ber vê yekê baweriya her kesî bi we tê. Çi heyf e ku li gorî felsefeya we hevalê mirovên ketî nîn e, lewre hûn baweriya xwe bi tu kesî nayinin. Ew felsefeya paşverû rê li ber we xera dike.

**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Aliyekî we yê hunermend heye. Her çiqas bi piranî bala we li ser zanista sirûştî be jî, hinekî bala xwe bidin bedewiyên li derdora xwe, bedewî xemla jiyanê ye. Nekevin dû bersiva pirsên bêkêr û hûrbijêrbin.



# Babosî û Fetah Beg

Li Herêma Babosiyê, gundiyek li nava zeviyên xwe tirî û fêkî (qetik, bejik, hirmê, sêv û hwd.) diçîne, selikên xwe tijî dike, kerê xwe bar dike û diçe Zoqê, fêkî-mêkiyan dibe ji begê Zoqê re. Di rê de mêrik rastî Fetah Beg dibe û Fetah Beg jî nas nake. Fetah Beg ji mêrik dipirse ka ew bi ku ve diçe. Mêrik dibêje ku barê xwe ji beg re dibe, ku Fetah Beg hinek baxşîş bidê. Fetah Beg dibêje: "Ku beg baxşîşê nede te û fêkiyên te jî ji te bistîne tuyê çi bikî?" Mêrik ji pirsê aciz dibe û çêrê Fetah Beg dike, dibêje: "Ezê terikê kerê xwe di diya beg bi... ku ew heqê fêkiyê min nede."

Fetah Beg deng nake. Di dilê xwe de dibehice, dibêje: "Ka tu were gund." Mêrik diçe gund mala Fetah Beg dipirse nîşanî wî didin. Mêrik diçe devê deriyê Fetah Beg, mêrik şaş dibe, lewre kesê di rê de leqayî wî bûye, ew Beg bûye. Fetah Beg ji mêrik dipirse: "Te ez naskirim?" Merik dibêje: "Erê"

Beg dibêje: "Ku ez heqê fêkiyên te nedim te, tê çi bikî?" Mêrik qet teredut nake û dibêje: "Mîrê min terikê kerê min hazir e ha!"

Di wir de ji ber ku mêrik netirsiya û gotina ku di rê de got dubare dike, Fetah Beg wî dibexşîne.

DILGERM NEMIRD

# Terazin û Seyda

Ji berê ve zilm û zoriya Begên Zoqê li ser gelê herêmê pir bû. Ên ku li hemberî beg derdiketin an jî baca xwe nedidan, Beg ew di terazin de berdidan xwarê.

Rojekê zilamekî tînin, wî jî baca xwe nedaye. Beg û Seyda bi hev re diçin ser terazinê. Mêrik di terazinê de berdidin xwarê, mêrik namire. Beg ji Seyda dipirse: "Seydayê min zilam çima nemir?"

Seyda jî dibêje: "Çakêtê wî ew xelas kir. Ba ket bin çakêtê wî nehişt bi şid li tahtan bikeve."

Beg dibêje: "Ka em te berdin xwarê, cubê te jî mezin e." Seyda di terazin de berdidin xwarê, Seyda dibe du tîşan.

DILGERM NEMIRD

# Kevroşkê Sûrgiçî

Mirovekî Sûrgiçî kevroşkekê digire. Êvarê wexta ku ji cot tê, kevroşkê bi xwe re tîne berî hewşa xwe dide. Li ber hewşê jî tu derî merî tune ne. Diçe haletê cot dide ber hewşê. Serê sibê radibe ku kevroşk nîn e. Diçe banî jîrikê gund dike, wî tîne dibêje:

– Bibêje, bê ka ev kevroşk di ku derê re reviya ye?

Jîrik diçe û tê, li hewşê digere, tê li haletê cot mêze dike. Dibêje: "Wele heye tune ye di ve pirika halet re derbas bûye û reviyaye."

(Sûrgiçî: Herêmek li dora Mêrdînê û navçeya Stewrê ye, ji 33 gundan pêk tê. Ev pêkenok tev ji wan re dibin mal.)

M. BEDRAN BÊNAV

# Leşkerê kuştî û çavên wî

Em û Mele Wehîdê Baqustanî (Rehme lê be) li Qoserê rûniştîbûn. Li ser pirsgirêkên gel em mijûl dibûn. Mirovekî gundî jî hat li nik me rûnişt, bidilşewatî got:

– We bihîst, 3 leşker hatine kuştin?

Ji ber ku her roj nûçeyên bi vî awayî me dibihîstin, ji me re xerîb nedihatin. Lê mixabin ku wî digot qey emê jî wekî wî bidelşewatî bipirsin bê ka çawa hatine kuştin. Mele Wehîd ji mêrik re got:

– Tiştek bi çavên wan hatibû, an na?

Gundiyê me li ser vê pirsê şaş ma, ka wê çi bibêje. Got:

– Na, tiştek bi çavên wan nehatibû.

Li ser vê bersivê Mele Wehîd biken got:

– De wê çaxê tiştek bi wan nayê. Ma ku çavên wan jî derketibûna teyê çi bikira?

Rebenê gundî rabû û li paş xwe nenihêrî û çû.

M. BEDRAN BÊNAV

www.arsivakurd.org

## Gerîlayan dîsa li Alaya Xozatê da

Li Dersimê hêzên artêşa tirk bi hezaran leşkeran operasyonê xwe didomînin. Li dijî operasyonan gerîlayên ARGK'ê jî bi cerd û kemînan bersivê didin.

Roja 18'ê gulanê, gerîlayên ARGK'ê cerdî Alaya Cendirmeyan a Xozatê kirin. Cerda gerîlayan nêzîkî saetekê dewam kir û di cerdê de 5 leşker mirin. Gerîla piştî êrîşê bêzaiyat vekişîn. Piştî vekişîna gerîlayan leşker bi ser gundên li dora Alayê ve girtin û gund xistin bin eblûqaya xwe. Gundê di bin eblûqayê de ne: Kilise, Sirtikan û Tavuklar in.

## Ji bo TV'ya MED 3500 îmze

Ji bo di demeke kin de TV– MED dest bi weşana kabloyê bike kampanyaya îmzeyê hate vekirin. Heta îro 3500 kesî, îmze dane kampanyayê. Li gorî agahiyan piştî Kantona Basel û Basselland wê kampanyaya îmzeyê li Kantona Zurich û Bernê jî dest pê bike û tê texmînkirin ku ê îmze bi rehetî ji 5 hezarî biborin.

## Reuters jî li sansûrê qelibî

Mahkemeya Ewlekariya Dewletê (DED) hevpeyvîna Reutersê ya ku bi Serokê Giştiyê PKK'ê Abdullah öcalan re di 24'ê gulanê de kiribû, sansûn kir. Hevpeyvîna Reutersê di rojnameya Yenî Polîtîkayê de hatibû weşandin. Mahqeme, di heqê her du saziyan de jî doz vekir.

## Madeya 8'an ne qanûnî ye

Dozgerê DED'a Stenbolê piştî lêpirsîna pirtûka, "Ji Fikrê re Azadî", di îdianameya xwe de eşkere dike ku madeya 8'an a qanûna 3713'an Benda 2'yan madeya 10'an ya Peymana Mafên Mirovan ya Ewrûpayê îhlal dike. Made bi vî şiklî rê li ber îfadekirina fikran digire.

# Ewrûpa yekîtiya gumrukê ji kurdan pirsî



Rayedarên rêxistinên Ewrûpî ji bo hînbûna rastiyên li Tirkiyeyê bi derdorên kurd re dikevin têkiliyê.

Serokên Komên Sosyalîst, Radîkal û Keskparêz yên Parlementoya Ewrûpayê, ji bo hin têkilî û hevdîtinan hatin Enqereyê. Serokan hevdîtina xwe ya pêşî bi parlementerên DEP'ê yên li Girtîgeha Enqereyê re kirin.

Roja 24'ê gulanê Serokên Koma Sosyalîstan Pauline Grin, Koma Radîkalan Catherine Lalumiere û Koma Keskparêzan Cludia Roth yên Parlementoya Ewrûpayê hatin Enqereyê. Û hevdîtina xwe ya pêşî bi parlementerê DEP'ê re li Girtîgeha Navenda Enqereyê kirin. Di hevdîtinê de parêzerê (ebûqat) DEP'vanan Feridun Yazar jî cih girt û hevdîtin nêzîkî 2 saetî dewam kir. Serokê Koman di hevdîtinê de ji DEP'vanan fikra wan a li ser Yekîtiya Gumrukê pirsîne. DEP'vanan jî li ser mijarê gotine: "Tirkiye berî her tiştî divê sozên ku dane, bîne cih. Lê, çi feyde heta îro tu sozên xwe neanîn cih. Ne di demokratîkbûnê de gav avêtine, ne jî ji bo çareseriya pirsgirêka kurdan riya siyasî vekirine. Divê dewlet ji bo çareseriya pirsgirêka kurdan riyên siyasî veke û ji bo bihevrebûneke bi biratî dest bi xebatê bike." Piştî hevdîtinê, Serokên Koman daxuyaniyek dan çapemeniyê û gotin: "Me bi parlementerên kurdan yên girtî re hevdîtinek çêkir. Û ji wan fikra wan a li ser Yekîtiya Ewrûpa pirsî. Li gorî dîtina me divê Yekîtiya Ewrûpa û Tirkiye nêzîkî hev bibin. Lê, divê Tirkiye xwe bigihîjîne normên medenî. Ev yek ji bo parlementoya Ewrûpa jî wisa ye."

**Navenda Nûçeyan**

## Li hemberî êrîş û provokasyonên kontrayên ji MHP'ê;

# Li Stenbolê serhildana taxa Nurtepeyê

**Di 20'ê gulanê de, saet nêzîkî 7.30'ê êvarê li taxa Nurtepeyê 5 kes li cadeya Sokollu bi îşareta "Gurê boz" li der dora xwe gule barandin. Piştî gulebaranê xelkê taxê civiyan û êrîşê protesto kirin. Prostestovanan pankart vekirin û sloganên avêtin.**



Li taxên Nurtepe û Güzeltepeyê bi hezaran kes li dijî provokasyonên faşîstan meşiyan.

Li Stenbolê piştî bûyerên taxa Gaziyê îcar li taxa Nurtepeyê gel li dijî êrîşa faşîstan rabû û bi serhildanê bersiv da. Roja 20'ê gulanê, komek alîgirên MHP'ê bi îşareta "Gurê boz" li der dora xwe gule barandin û di gulabaranê de zarokek birîndar kirin. Piştî gulebaranê bi hezaran mirov civiyan û provokator protesto kirin.

Di 20'ê gulanê de, saet nêzîkî 7.30'ê êvarê li taxa Nurtepeyê 5 kes li cada Sokollu bi îşareta "Gurê boz" li der dora xwe gule barandin. Piştî gulebaranê xelkê taxê civiyan û êrîş protesto kirin. Prostestovanan pankart vekirin û sloganên wekî, "Nurtepe û Güzeltepe wê bibe goristana faşîzmê" avêtin. Piştî demekê gelek tîmên taybet û polîs li taxê civiyan û xwestin ku bi panzeran xelkê belav kin. Li ser vê yekê xelkê bi malzemeyên înşaatan yên li ser derdorê barîkat (bend) çêkirin.

Piştî ku bûyer li Okmeydani, Gazi û Yeşilpinar hate sehkirin xelk li van taxa jî civiyan û bi aliyê Nurtepe ve dest bi meşê kirin. Polîsan li nêzîkî parka Fatma Girik pêşiya meşvanan girtin û ji wan sekinandina meşê xwestin. Gel dev ji meşê berneda û di nav gel û polîsan de şer derket. Polîsan meşvan gulebaran kirin. Di gulebaranê de kesek birîndar bû. Piştî demekê polîsan bi panzeran êrîşî gel kirin û di bûyerê de 30 kesî jî binçav kirin.

Eynî saetan gel li taxa Alibeyköyê jî civiya û bi aliyê Nurtepe ve dest bi meşê kir. Polîsan li nêzîkî pira Alibeyköyê pêşiya meşvanan birîn. Li vir jî di navbera polîs û gel de şer derket. Di şer de gelek kes birîndar bûn. Bûyerên li Nurtepe, Gazî, Okmeydanı, Yeşilpınar û Alibeyköy heta şevegê dewam kirin.

**Navenda Nûçeyan**



www.arsivakurd.org

hevnêzîkkirina gelên cîran û gelên Rojhilata Navîn e.

**Di weşanan de hûnê çiqas cih bidin zimanên din (tirkî, îngilizî)?**

– Zimanê giştî û resmî yê TV–MED'ê kurdî ye helbet. Serdestî û deshelatdariya zimanê kurdî eşkere ye. Piraniya naverok û programên TV–MED'ê şaxên kulturî û hunermendî, rewşenbîrî û edebî bi zaravayên kurdî ne. Wekî nimûne; mirov dikare qala xeberan bike. Xeber 15 deqîqe bi kurdî û 5 deqîqe jî bi tirkî ne. Di hin programan de jî wekî gotûbêj, pirs û bersiv, carinan pêwistî bi zimanê tirkî jî dibe ku çêbe.

Di bersiva vê pirsê de rêje diyarkirin û ji sedî ewqas kurdî û ewqas tirkî ye gotin, ne dijwariyek e ku îş jê xera bibe û TV–MED bi xizmet û erkên xwe ranebe.

Weşanên bi îngilizî jî girêdayî hewcedariyan, pêşketin û guhertinên ji îro û pê de ye, dikare têkeve rojevê.

**Gotûbêjên ku li ser mijarên cur bi cur di TV–MED'ê de derdikevin gelek balê dikişînin ser xwe. Gotûbêja yekemîn li ser îşxala dewleta tirk a başûrê Kurdistanê, gelek deng da. Di vê bernameya yekemîn de ji xeynî çend rewşenbîr û siyasetvanên tirk û kurdên Bakur, nûnerên PDK û YNK'ê jî cih girtibûn.**



**Tu pest û zora hikûmetên Ewrûpa li ser TV–MED'ê heye, hebe çawa?**

– Pest û zora hikûmetên Ewrûpayê li ser TV–MED'ê rasterast nîn e. Pest û zora heye jî, ji ya hikûmetên Ewrûpayê zêdetir ya dewleta tirk e. Dewleta tirk nasekine, bi riya avahî û saziyên xwe li Ewrûpayê çapemenî, radyo û televîzyona xwe bela xwe ji TV–MED'ê venake û bêetlahî ji hikûmetên Ewrûpayê dixwaze ku weşanên MED'ê bisekinînin.

Belê wa diyar e, giştî hewlên dewleta tirk bi avê de çûn û êdî ev dewlet dibe ku karibe pişta stûyê xwe bibîne, belê dê rawestandin û girtina TV–MED'ê nebîne.

**Li çend welatan MED dikare bête temaşekirin?**

– Li seranserî Ewrûpayê û li piraniya Rojhilata Navîn mirov dikare li TV–MED'ê temaşe bike.

**Hûnê giraniyê bidin kîjan bernameyan?**

– Pirs û pirsgirêkên me yên qirnan û sedsalan ketine ser hev. Pirs û pirsgirêkên me yên destnedayî bi dehan û bi sedan in. Ji bo giştî bernameyên me û siyaseta televîzyona me piralî bûn, dewlemendî û rengarengî dê bibe noqta hereketê.

TV– MED'ê dê cih bide hemû pirsan, hemû dabaş û temayên perwerdekariyê, pirsên edebî, kulturî, siyasî û dîplomatîkî, dê cih bide hemû, pirsên jinan, zarok û ciwanan, pirsên ziman û zaravayên siyasî û pirsên penaber û derketiyên li derveyî welêt û bi taybetî kurdên li Sovyeta kevin.

**Hûn ji objektîfbûna weşanê çi fêm dikin?**

– Ji objektîfbûna weşanê ev dikare bê fêmkirin:

1) Divê mirov cih bide aliyên rast ên pirs û pirsgirêkan


2) Divê mirov bi çavê gelê kurd û ji awira berjewendên piraniya gelê kurd li bûyeran binêre û bûyeran bigire dest.

**Tu gotinên we hene ji bo temaşevanan?**

– Ji bo temaşevanan gotinên me ev in: Ev televîzyon bi qenc û xerabên xwe, bi hemû parçe û aliyên xwe, bi hemû zarava û mezhebên xwe, bi giştî rûniştvanên Kurdistanê; bi kurd, suryanî, keldanî û elewiyên xwe, bi kesên kurd û ne kurd ku dixwazin li TV–MED'ê temaşe bikin ev televîzyona wan e.

Temaşevanên me bila dîtinên xwe, rexne û pêşniyarên xwe ji me re bişînin, bi huner û şarezayiyên xwe ji bo me bibin alîkar.

HEVPEYVÎN:
MAZHAR GÜNBAT



**TV– MED'ê dê cih bide gişt pirsan, gişt dabaş û temayên perwerdekariyê, pirsên edebî, kulturî, siyasî û dîplomatîkî, dê cih bide gişt, pirsên jinan, zarok û ciwanan, pirsên ziman û zaravayên siyasî û pirsên penaber û derketiyên li derveyî welêt û bi taybetî kurdên li Sovyeta kevin.**

www.arsivakurdi.org



**Serokê PSK'ê Kemal Burkay:**

# 'Şerê li dijî dagirkeriyê heq e'

Serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) Kemal Burkay, di civîna KOMKAR'ê de got: "Şerê ku PKK li hemberî Komara Tirkiye dimeşîne, ne teror e. Di 20'ê gulanê de li bajarê Almanya li Kolnê bi munasebeta civîna Kongreya Yekîtiya Komeleyên Kurdistan (KOMKAR) ya di 14'ê de, Serokê PSK'ê Kemal Burkay jî axaftinek kir. Burkay di axaftina xwe de bi giştî li ser rewşa kurdan û problemên ku li pêşberî wan in, sekinî.

Li gorî Burkay, li Tirkiyeyê pirsgirêkeke kurd heye û her car Tirkiye dixwaze bide nîşandan ku PKK terorîst e, lê şerê PKK'ê ne yê terorîstiyê ye. Burkay di axaftina xwe de li ser şerê neteweyî sekinî û ev got: "Şerê li hemberî mêtingehkariyê heq e."

Serokê PSK'ê Burkay, qala rewşa başûrê Kurdistanê kir û diyar kir ku ji ber şerê birakujiyê, fersenda ku kurdan xistibûn destê xwe her diçe ji dest wan derdikeve. Burkay li ser avakirina Parlementoya Kurdistanê ya Derveyî Welêt jî wiha axifî: "Ne li hundir û ne jî li derveyî welêt, ji bo avakirina saziyeke wiha rewş ne musaîd e. Avakirina saziyên wiha, divê ne li gorî hewesê be. Li gorî me di vê pêngavê de tiştê ku lazim e, damezirandina kongreya neteweyî ye." Di axaftina xwe de Burkay diyar kir ku avakirina TV–MED'ê, serkeftinek e. Burkay got ku ji destê me bihata û îmkanên me yên aborî rê bidana, me yê jî televîzyona kurdî ava bikira. Serokê PSK'ê Kemal Burkay, di axaftina xwe ya li civîna KOMKAR'ê de rexne li hereketa xwe jî kir. Burkay rexneyên xwe bi vî awayî anîn zimên: "Gelek tiştê ku em tê de bi ser neketin jî hene. Di avakirina cepheya Neteweyî de em bi ser neketin. Ev ji bo Kurdistana Tirkiyeyê, kêmasiyek e. Em tirsiyan ku pirsgirêka kurd, bibin Neteweyên Yekbûyî (NY). Ev jî kêmasiyek bû."

**Navenda Nûçeyan**

## Kemînên gerîla li hemû Kurdistanê belaya serê artêşa tirk in

# Li Botan leşker ketin kemînê

Vê hefteyê jî operasyonên hêzên dewletê dewam kirin û gerîlayên ARGK'ê jî bi êrîş û kemînan bersiv dan. Şer bi taybetî li herêma Botan gur bû û li gelek deverên herêmê gerîlayan êrîşên xurt birin ser hêzên artêşa tirk. Di van êrîşan de gelek leşker mirin û birîndar bûn.

**15.05.1995**

Li gundê Şukraniz ku li ser Tuxa girêdayî Bilîsê ye di navbera gerîlayan û cerdevanan de şer derket. Di vî şerî de cerdevanek mir û 2 cerdevan jî birîndar bûn.

Li gorî agahiyan, li Nisêbînê gel 3 endamên Hizb–î Kontrayê kuştin.

**16.05.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li navbera Dêrsimê û Mazgirtê êrîş birin ser hêzên dewletê. Di vê êrîşê de 3 leşker mirin, 4 leşker jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê di navbera Mêrdînê û Mahsertê de li mayînên gerîlayan qelibîn. Di vê bûyerê de 4 leşker mirin.

**17.05.1995**

Di navbera riya Amedê û Mêrdînê de cemseyeke artêşa tirk li mayîna gerîlayan leqitî. Di vê livbaziyê de 7 leşker mirin û 5 jî birîndar bûn.

Hêzên ARGK'ê li navbera Sêrtê û Dihê êrîşî ser komek leşker kirin. Li gorî agahiyan, di vê êrîşê de 10 leşker mirine.

Gerîlayên ARGK'ê li çiyayê Gabarê li hemberî hêzên dewletê livbaziyek pêk anîn. Di vê livbaziyê de 4 leşker mirin û 7 leşker jî birîndar bûn.

**18.05.1995**

Gerîlayan li Geverê li gundê Eskê êrîş birin ser cerdevanan. Di vê êrîşê de 4 cerdevan mirin, 3 cerdevan jî birîndar bûn.

Li Botan, li çiyayê Gabarê di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket. Li gorî agahiyan di vî şerî de 4 leşker mirine.

Li navçeya Mêrdînê Mahsertê, li gundê Servetiyê di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şerekî mezin derket. Li vê deverê, 18 leşker mirin.

**19.05.1995**

Di navbera Cizîrê û Şirnexê de cemseyeke dewletê rastî mayîna gerîlayan hat. Di vê bûyerê de cemseyek îmha bû û leşkerek jî mir.

Gerîlayên ARGK'ê êrîşî tabûra Gemanê kirin. Piştî êrîşê her du aliyan li hev dan, di bûyerê de 7 leşker û 3 gerîla mirin.

Li Kuramê ku gundê Qabilcewaza Sêrtê ye di navbera cerdevanan de şer derket. Di vî şerî de cerdevanan 5 kes ji hev birîndar kirin. Yek ji birîndaran mir.

**20.05.1995**

Gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê, di navbera Dêrsimê û Nazimiyê de şer kirin. Di şer de 10 leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.



Gerîlayan li Sêrtê li warê Hadîtê tîmên taybet xistin kemînê. Di vê kemînê de 5 tîmên taybet mirin û 8 jî birîndar bûn.

Gerîlayan li Botan êrîş birin ser tabûra Dişareş. Di vê livbaziyê de, li gorî agahiyan 4 leşker mirine û 5 leşker jî birîndar bûne.

Li Şemzîna gundê Katîna di navbera gerîla, leşker û cerdevanan de şer derket. Di vî şerî de 3 leşker û cerdevanek mirin û 10 leşker jî birîndar bûn.

**21.05.1995**

Li Geverê, li warê Şîfrezaran komek cerdevan ketin kemîna gerîlayan. Di vê kemînê de 7 cerdevan mirin û 10 cerdevan jî birîndar bûn.

Li gorî agahiyên li devera Botan, li warê Şîfrozan 2 kontra ji aliyê gerîlayan ve hatine kuştin.

Li navçeya Êlihê Qabilcewazê di navbera gundên Hola û Çîfnê de hêzên dewletê pê li mayîna gerîlayan kirin. Di vê bûyerê de binbaşiyek û 5 cerdevan mirin.

Hêzên dewletê li ser riya di navbera Erzeromê û Çewlikê de pêl li mayîna gerîlayan kirin. Di vê bûyerê de 2 leşker mirin û 14 leşker jî birîndar bûn.

**22.05.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li Kaşûriyê di warê Elamun de yekîneyeke hêzên dewletê xistin kemînê. Di vê kemînê de 4 leşker mirin û 2 leşker jî birîndar bûn.

Gerîlayan li Dêrsimê êrîş birin ser tabûra Xozatê. Di vê êrîşê de 10 leşker mirin û 15 leşker jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê li Botan, li çiyayê Gabar ketin kemîna gerîlayan. Di vê kemînê de 10 leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.

**KURD–A**

## Rojnameya Serxwebûn bala raya giştî kişand ser lîstikên dewletê

# 'MİT'ê bi logoya me rojnameyek derxist'

Rojnameya "Serxwebûn" roja 21'ê gulanê daxuyaniyek weşand. Li gorî daxuyaniyê, MİT'a komara tirk bi logoya Serxwebûnê rojnameyek çap kiriye û rojname bi poste ji gelek navnîşanan re bi rê kiriye. Daxuyaniya rojnameya "Serxwebûnê wiha didome: "Komara tirk di warê leşkeriyê de derbeyê mezin dixwe û ji bo veşartina rewşa xwe jî her diçe şerê psîkolojîkî zêdetir dike. Mînaka dawî jî, MİT'a tirk bi logoya me rojnameyek çap kiriye û di rojnameyê de ji nivîsên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hin tişt guherandine an jî pêve danî ne ku jê maneyên nerast derên. Lê, raya giştî dîtinên Abdullah Öcalan ji nêzîk ve dizane û naveroka rojnameya me jî dîsa tê zanîn. Bêşik ev ne lîstikeke nû ye û komara tirk gelek caran lîstikên bi vê şiklî kirine." Di dawiyê de jî hatiye gotin ku ev lîstik rewşa komara tirk dertîne holê ku di çi rewşê de ye.

Tê zanîn ku berî demeke kin rojnameya Riya Azadî jî daxuyaniyek dabû û gotibû ku MİT'a tirk bi navê Roja Azadî rojnameyek derxistiye û xwestiye ku bi rojnameya sexte dubendiyê bixe nav rêxistin û partiyên kurdan.

**KURD–A**

## Dîroka rast li dibistanên tirk nayê fêrkirin

# Osmaniyan 137 birayên xwe yên zarok xeniqandine

**Sultanên Osmaniyan 137 birayên xwe, şehzadeyên hê zarok bi emrê şêx-ûl îslaman çawan xeniqandin? Padîşah Osman ê I. yeniçerê bi çî awayî kuştin? Yavuz Sultan Selîm 40 hezar kurdên alevî çawan qir kirin? Kuyucu Murat Paşa bi hezaran mirov çawan avêtin nava çalên axê? Waliyê Wanê Melik Ehmed Paşa bajarê Bidlîsê çawan wêran kir û çi anî serê yêzîdiyên Şengalê? Dawiya serhildanên Babaniyan, ya Rewandizê, Bedirxan Begê, Şemizdîna şûr ên xwînmêj çend serî avêtin? Enwer, Telat û Cemal Paşa kî bûn? Ew kî bûn ku deşt, çiya, çol û newal ji 1,5 milyon ermeniyan re kirin goristan?**

Dîrok wekî qûtîka neynik ronahiyê ye. Mirovê hez bike ku pêşeroja xwe bibîne û pengavên xweş û qahîm bavêje, pêwist e li paş xwe bizivire û temaşe bike wê li neynikê. Neteweyên ku borîna xwe baş nizanin, berahiya wan jî wê her tarî, asteng û alozî be.

Bersiva van pirsan; "Ez kî me? Ji ku derê hatime? Dê biçim ku derê? Dost û dijminên bav û kalên min, ên war û welatê min kî ne?" dîrok dide. Ji bona wê girîngiya dîrokê pedivî ye ku her kurdê welatparêz û azadîxwaz dîroka tirk, ereb û farisan baş bizane.

Wan rojan artêşa tirk êrîş bir başûrê Kurdistanê, her wekî xwendevanên Welatê Me jî bihîstin li devera Behdînan 7 şivanên kurd ên bêguneh bi hovîtî hatin kuştin û guh, lêv û difinên wan jî hatin birîn. Li ser wê bûyerê, serbazekî artêşa tirk ê giregir li rûyê rojnamevanên xwe yên nîjadperest înkariya wê tevkujiyê bi van peyvan ve anî zimên: "Kuştina mirovan bi vî awayî di dîroka me de tune." Li ser wê durûtiya ku 900 sal e ew didomînin, ez dixwazim di vê nivîsê de çend rêzikan ji dîroka wan ya ku bi xwîna bindest, jar û belengazan ve hatî nexşandin bînim bîra kurdên Xwedan doz û xwedan rûmet. Mîna hemû kedxwar û dagirkerên dinyayê osmanî û neviyên wan ên îro dîroka xwe bi du beşan çêkirine. Yek dîroka fermî ya din jî ya rastî ye. Dîroka ku îro di xwendingehan de didin xwendin ya fermî ye û xîmê wê li ser talan, bêbextî û derewan hatiye avêtin. Pêxwarin, taştê û firavîna rayedarên dewletê, serbaz û serleşkeran e. Ew hebana viran e. Ew bi wê xapandinê ve hatine têrkirin û tijîkirin. Dîroka rastî jî di nava rûpelên hin pirtûkan de dibin şîv û paşîva mişkan.

Sultanên Osmaniyan 137 birayên xwe, şehzadeyên hê zarok bi emrê şêx-ûl îslaman çawan xeniqandin? Padîşah Osman ê I. yeniçerê bi çî awayî kuştin? Yavuz Sultan Selîm 40 hezar kurdên alevî çawan qir kirin? Kuyucu Murat Paşa bi hezaran mirov çawan avêtin nava çalên axê? Waliyê Wanê Melik Ehmed Paşa bajarê Bidlîsê çawan wêran kir û çi anî serê yêzîdiyên Şengalê? Dawiya serhildanên Babaniyan, ya Rewandizê, Bedirxan Begê, Şemizdînan şûr ên xwînmêj çend serî avêtin? Enwer, Telat û Cemal Paşa kî bûn? Ew kî bûn ku deşt, çiya, çol û newal ji 1,5 milyon ermeniyan re kirin goristan? Di berxwedana Şêx Seîd de li herêma Diyarbekirê (Amed) qesabên kemalîstan çi kirin? Şikeftên Dêrsimê çiqas komên hestiyan û mirovên şewitî dîtin? Yên ku ev 11 sal in li gund, navçe û bajarên Kurdistanê mirovên jîr, zana û rewşenbîran direvînin û çend rojan, an jî çend mehan bi şûn de kelexên wan yên bêser û guh û çav diavêjin ser devê rê û rêbaran qey ezmanî ne? Yên par 37 şair û nivîskar li bajarê Sêwazê bi saxî sotin kî bûn?

Civat û komên gelên berfireh bersiva van pirsan tu caran nizanin bidin. Ji ber ku wan baş dîroka rast nexwendine û nebihîstine.

Ji xwe xwendindayin û pêhisandin wê jî qedexe ye. Li virê hêviya min ji hemû dilsoj, hogir û hevalbendên bindestan ew e ku ger derfetê bibînin bila dîroka neyar û mêtingehan bixwînin û bidin xwendin. Dê wê gavê rûyê xwînrêjan yê pêçavtî derkeve holê. Dê camêrên xuyanî û biyanî bizanin ka barbarî û qelandina mirovan karê kê ye?



Şêx Seîd

Binêrin dema serhildana Bedirxan Begê artêşa osmanî li herêma Botan çi kiriye, ev gotin yên kirêkirîyê wan generalê alman Moltke ne. (Nameyên Tirkiyeyê rûpel:192)

"Ez çûme nik Hafiz Paşa ku li serê girekî temaşeya seriyan dikir. Xenîmet û yên dîlgirtî dianîn wir. Zilam û jinên di nav xwînê de birîndar, di hemû temenan de zarok, heta yên berşîr û ser û guhên birî (jêvekirî), herçî kesên ku ew hemû dianîn 50–100 qurûş bexşîş didanê. Jana bêdengiya kurdan û hewara jinan a bêhêvî rewşa dilikên parvekirî dida ber çavan."

Belê, ser û guhên kurdan bi buhayê 50–100 qurûşan hatine birîn. ew jî gelek ne dûr e, 148 sal beriya roja em tê de ne. Hem jî li hember çavên zabitên alman....."

**ÎHSAN CÛLEMÊRGÎ**

## Di îslamiyetê de xelîfetî

"Di îslamiyetê de xelîfetiyê sîh sal û şeş mehan dom kiriye." Di dînê îslamê, mezhebê ehlî sunet û civata suniyan de xelîfetiyê ewqas dewam kiriye. Di pey de ne xelîfetî, lê sultaniyê (zordarîtî) hikum kiriye. Heta li gorî hediseyan de piştî mirina Hz. Muhemmed (A.S) xelîfetiyê sîh salî dom kiriye.

".... Riwayet dom dike, dibêje: "Ebû Ubeyt bînî el Cerah gotiye: "Hz. Muhemmed (A.S) wiha gotiye: "Muheqeq ez ewiliyê dînê we me. Pêxemberiya min dest pê kir û ev 'pêxemberî û rehmet e' di pey de xelîfetî çêdibe. Ev ji 'xelîfetî û rehmet e.' Piştî vê padîşahtî (sultanî) ango zordarî çêdibe. Ev jî 'sultanî û zordarî ye' Hedîsa Hesen (Tarîx ul Xulefa r.10)"

Hedîseya dudayan...

"Sûfeynet gotiye: Min ji Hz. Muhammed (A.S) bihîstiye. Wiha digot, "Xelîfetî sîh sal e (di pey min de xelîfetî wê sîh sal dom bike), di pey de padîşahî û sultanî ye, yanê împaratorî ye."

Hinek alîman gotine ku şeş meh jî zemanê. Hz. Hesen û Huseyn e. (Tarîx ul xulefa r. 9, Tarîxa her çar xelîfeyan r. 9–10).

Piştî mirina Hz. Hesen û Huseyn, xelîfetî qediya, sultaniyê dest pê kir. Ebasî, Emewî, Osmanî hemû zordarî bûn, xwîn rijandin, metingehkarî kirin.

Cîranên me yên xwedî dewlet (Îran, Iraq, Tirkiye û Sûriye) her dem dînê îslamê ji xwe re kirine mertalê metingehkariyê. Osmaniyan jî bi vê yekê şeş sed salî hikum kirin. Ji Hindistanê heta dergehê Viyanayê welat vegirtin. Her tim zilm û wehşetiya xwe di bin perdeya vî dînî de pêk anîn. Îro jî li Kurdistanê vê wehşetê dikin; pîr, kal, jin, mêr, zarokên me dikujin, me talan dikin û vê jî xwedigiravî li ser navê îslamê dikin.

Piştî ku sultanê tirkan Yavuz di sala 1514–1516'an de bi alikariya Îdrîsê Bitlîsî talam kir û çû Mek û Medîn kirin bin hikmê xwe, ala îslamiyetê jî xist destê xwe. Di destekî ala îslamiyetê û bi destekî din jî ala turanîtiyê girt. Gel û welat pelçiqandin.

Bi vê yekê ji nesekinîn sunî û alevî jî berî hev dan. Li Kurdistanê, di nava kurdan de dijminatiyeke nû çêkirin. Ji ber ku kurdan misilmanetî bi awayekî saf û pak qebûl kiribûn, ji aliyê Osmaniyan ve hatin xapandin, ku hîn ji tên xapandin.

Ez hêvîdar im ku kurd êdî hişyar bibin, misilmaniyê baş nas bikin, xwe û rastiya dîroka Kurdistanê ji qenc nas bikin. Êdî bes e. Divê em li dinyayê binihêrin, gelên dinyayê hemû azad bûn, serfiraz dijîn. Ême jî, va ye karkeran şoreşa serfiraziya me bi pêş xistiye. Hemû kurd, çi mislaman, çi êzdî, çi sosyalîst, çi sunî û alevî, bi hev re bin, mîna bira bin. Wekî kulmeke şoreşgeran li eniya dijmin û misilmanên sextekar bikevin. Welatê xwe ji wan bistînin. Misilmaniya rast jî û înasaniyeta sasoyalîzmê jî ku em nîşanî wan ramanqirêjan bidin.

**MELE BORAN**

# Konferansa wêjeya kurdî

Di 17–18'ê meha pûşpera (hezîran) 1995'an de, Yekîtiya, Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) bi navê Konferansa Edebiyata Kurdî konferansekê amadê dike.

Di vê konferansê de li ser hin beşên edebiyata kurdî semîner tên dayîn û gotûbêj tên çêkirin.

Tevî gelek rewşenbîrên kurd, weşanxane, kovar û rojnameyên kurdî yên kulturî û edebî hatine jî vexwendin.

**Komîta Amadekar a Konferansê**

PROGRAM

**17.06.1995**

9.00–13.00: Di edebiyatê de teorî, rexne û metodên rexnegiriyê.
Semînerdar: Şerefxan Cizîrî, Rohat, M. Seîd Hesen
Di edebiyata kurdî de zimanê kitêbên pîroz
Semînerdar: Malmîsanij
14.00–16.00: Di zimanê kurdî de edebiyata zarokan
Semînerdar: Elî Çiftçî, Cano, Hecî Memo.
17.00–19.00: Di edebiyata kurdî de helbest
Semînerdar: Mahfoz Mayî, Ebdurehman Mizurî, Ebdurehman Durre, Xebat Arif, Taha Mazhar, M. Emîn Pêncuwenî.

**18.06.1995**

9.00–12.00: Di edebiyata kurdî de çîrok
Semînerdar: Ferhad Shakely, Firat Cewerî, Hesenê Metê.
13.00–17.00: Di edebiyata kurdî de roman
Semînerdar: Îbrahîm Ehmed, Selîm Berakat, Nacî Kutlay

**Cih:** Biskops Arno Folkhögskola–Bâlsta
**Dem:** 17–18.06.1995
**Adresa ji bo têkiliyê:**
Föreningen För Bevarandeto Utvecklingav Kurdiskkultu
Strandv 5/B 114 51 Stockholm/ Sweden
**Telefon:** 08. 663 38 43
**Fax:** 08. 667 47 42

**(Zazakî)**

17–18'ê pûşpera (hezîrana) 1995'î di, Yeweya Roşinvîranê Welatperweran ê Kurdistanî (YRWK) bi name bê Konferansê Edebiyat ê Kurdkî konferansêk hadirekena. Nê konferansî di, tanî waranê edebiyatê kurdkî ser o semînerî yenî dayen û munaqeşey yenî kerden.

Gelek roşinvîrê kurdan weşanxaney, kovarî û rojnamey kurdan zî amey de wet kerden.

**Komîteya Hadirekerden a Konferansî**

**PROGRAM**

**17.06.1995**

9.00–13.00: Edebiyatî di teorî, kirîtîk û metodê kirîtikkerdene
Semînerdayoxî: Şerefxan Cizîrî, Rohat, M. Seîd Hesen
Edebiyatê kurdkî di ziwanê kitaban ê pîrozan
Semînerdayoxî: Malmîsanij
14.00–16.00: Ziwanê kurdkî di edebiyatê domanan (qeçekan)
Semînerdayoxî: Elî Çiftçî, Cano, Hecî Memo
17.00–19.00: Edebiyatê kurdkî di şîri
Semînerdayoxî: Mohfoz Mayî, Ebdurehman Mizurî, Ebdurehman Durre, Xebat Arif, Taha Mazhar, M. Emîn Pêncuwenî.

**18.06.1995**

9.00–12.00: Edebiyatê kurdkî di novel
Semînerdayoxî: Ferhad Shekely, Firat Cewerî, Hesenê Metê
13.00–17.00: Edebiyatê kurdkî di roman.
Semhinerdayoxî: Îbrahîm Ehmed, Selîm Berakat, Nacî Kutlay.

**Ca:** Bikops Anrö Folkhögskola–Bâlsta
**Wext:** 17–18 06.1995
**Qandê têkilyanê rê adres:**
Föreningen För Bevarandeto Utvecklingav Kurdskkultu
Strandv. 5/B 114 51 Stockholm/ Sweden
**Telefon:** 08. 663 38 43
**Fax:** 08. 667 47 42



## Lal / Govenda Hilo: Mirin di nava mirov de ye

Koma Teatra Evîna Welat heftiya borî li Stenbolê, li Evrensel Kultur Merkezî lîstika Lal / Govenda Hilo pêşkêşî komek temaşevan kir. Ev lîstika xwerû bi kurdî ji aliyê Huseyin Kaytan ve hatiye nivîsandin. Lîstikvanên Koma Teatra Evîna Welat bi vê lîstikê wêneyekî ji dîroka gelê kurd tînin ber çavan. Di gotinên senaryoya Lal / Govenda Hilo de mirov rastî hin cumleyên balkêş tê. Yek ji wan cumleyan ev bû: "Mirin di nava mirov de ye."

### Ji Teatra Jiyana Nû

# ROJBAŞ


*"Rojbaş destpêka roja nû ye, wekî hemû car û deman"*

Teatra Jiyana Nû, ku xebatên xwe li Navenda Çanda Mezopotamyayê didomîne, piştî amadehiya heft mehan lîstikeke nû derdixe ser dikê. Lîstik bi navê "Rojbaş" e û ji sê perdeyan pêk tê.

Koma Teatra Jiyana Nû, di daxuyaniya xwe ya nivîskî de eşkere dike ku ev lîstik ji aliyê wan ve hatiye nivîsin û bi tevî Mamoste Cemil ew derxistine ser dikê (sehneyê).

Ji aliyê din ve, didine zanîn ku lîstik bi azineya (metoda) epîzot amade bûye û di nava xebatên amadekirina nivîsîna vê lestîkê de Başak Kanat jî hebûye. Tê zanîn ku Başak Kanat, di encama gulebarakirina otobûsê de hatibû kuştin.

Di daxuyaniyê de tê diyarkirin ku "Divê her tişt derkeve ser dikê, tirs û mêrxasî; ketin û rabûn; îxanet û berxwedan wekî jiyana kurdan bi hev re werin ser dikê û bi hev re werin pêşkêşkirin. Tenê bi vî awayî jiyan aşîkar dibe."




**Afîşa lîstika "Rojbaş"**

Lîstika Teatra Jiyana Nû Rojbaş wê di navbera rojên 27–28'ê gulanê û 3–4'ê pûşperê (hezîranê) de li Ortaköy Kültür Merkezî li Stenbolê saet di 16.00'an de bê pêşkêşkirin.

**Serwîsa Çandê**

## Banga Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK)

Mamosteyên birêz!

Sala Ehmedê Xanî, sala zimanê kurdî, sala avakirina saziyên neteweyî yên kurdî û bi giştî sala gelê kurd 95, bi germiya şoreşa serxwebûn û azadiyê geş dibe.

Êdî gelê kurd gavên dawî ber bi dewletbûnê ve davêje. Hevsarê dîrokê girtiye dest xwe û dikişîne ser mirovahiya hemdem. Herkesê kurd, herkesê mirovperwer di cihê xwe de, di nava sazî û yekîtiya xwe de, di vê pêşveçûna pîroz de dibe xwedî par.

Mamosteyê kurd jî, di nava yekîtiya xwe YMK'ê de deynê dîrokê bi berpirsiyarî hildigire.

Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) we bi germiya şoreşê silav dike û ji dil û can we vedixwîne kongreya xwe ya awarte.

**Mêjû:** 11.06.1995
**Saet:** 10.30
**Navnîşana cih:** Faulenstr. 9 Bremen
**Komela Hevaltî**
**Tel:** 0421–1692646

**Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK)**
**Komîteya Kargêr**

www.arsivakurd.org

# TÎTÎ Û GAMÊŞ



Li hêleke Kurdistan
Li Newala Bûnisran

Li perê çemê Ceqceq
Bêxem dijya tîtiyek

Biharê li keviya rê
Di bin gwînî nav axê

Ji pûş ava kir hêlîn
Bi dilbijî, bi evîn,

Ber çavê wê wek xanî
Çar hêk, li binî danî.

Sê hefte, ser wan rûnişt
Rojek hêkên wê qelişt.

Ji wan derketine çêlî
Bi nukil û bi kofî,

Kumka serî radibû
Bi wan gelek şad dibû.

Rewil, tovik dianî
Devê wan de datanî

Dîsa li wir, wê gavê
Di nav av û çiravê

Gamêşek bêcir hebû
Haya wan jê tunebû,

Qiraxa rê diçêrî
Dibe ku ji xemsarî

Ber bi hêlînê ve çû
Tîtî bi lez berda dû;

Çêliyan kir wîrewîr
Bin sima wê bûn hevîr.

Tîtî rabû xwe hilda
Ser çavê gamêşê da

Di dev de pûş û kelem
Tew ji xwe re nekir xem

Tîtî çû ba tilûran
Li gamêşê bû dozvan

Got: "Gamêşê wiha kir
Malik li min xera kir;

Her çar çêliyên min kuştin
Bêdûnda û hêlîn hiştin.

Zû çarekê bibînin
Tola min jê hilînin."

Du başoka xwe hildan
Wek tîr derket ji kevan

Dadan gamêşa kujyar
Bi nukilên tûj û har

Çavên wêna deranîn
Tola tîtî hilanîn.

Her roj li pêş çavê wê
Gamêş diçû çiravê

Dil û cergê wê disot
Tilûran re wiha got:

"Gamêşa kujyar, dijî
Ne bi min û ne we jî...."

Teyar got: "Hew ji me tê
Hêza me pê nagihê."

Ji ber dilê wê disot
Bûyer, li her derê got.

Beqek pîr û çemisî
Bi bûyera wê hesî

Bo tîtiyê dilsotî
Peymanek ji dil gotî:

"Giha Xwedê, giha min
Tol li erdê namînin...."

Bûbû havîna gewrik
Sincirîn ax û tahtik,

Nîvro, çaxê nimêjê
Germê dabû gamêşê

Germek har û fetisok
Mêjî lê kir bablîsok

Wê daketa çiravê



Xwe sar kira bi avê;

Beqê tevî hevala
Ketin bin latek bala

Li wir kirin qurequr
Bo ku gamêş were wir.

Dudilî û saw negirt
Xwe li dengê beqan girt

Gamêşa kor û kujyar
Ji latê ve hate xwar,

Gindirî kortal û best
Çîp û stûyê wê şikest.

Hate ser ecelê xwe
Tevan re bû berate;

Beqa pîr û aqilmend
Heyfa tîtî wisa stand.



**Î. OMERÎ**

# N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

### Di heftiyekê de du "tesî"

Xebatkarên rojnameya Welatê Me merhaba! Em ewil silavê xwe yên germ ji we re bi rê dikin û serkeftina we dixwazin. Hevalno, van rojên han di nava me û çend kesên tirk de li ser zimanê kurdî gengeşiyek çêbû. Kesên tirk gotin: "Zimanê kurdî ji çend zimanên der dora xwe pêk hatiye. Peyvên wê erebî, farisî û tirkî ne. Zimanekî wiha tune. Û ev kes xwedê giravî demokrat bûn jî. Lê wekî apê xwe Alpaslan difikirin. me jî ji wan re got: "Werin em li ser navê rojan bisekinin. Ka navê çend rojan bi tirkî ye? Me dest pê kir û got; pazar, pazar ji peyva îngilîzî "Bazaar"ê tê. Pazartesî ew jî pazarê hatiye çêkirin. Salı bi erebî ye. Çarşamba jî çarşema kurdî ye. Perşembe, pêncşema kurdî ye. Cuma bi erebî ye. Cumartesî jî ji cumayê hatiye, çêkirin. Me ji tirkên demokrat re got: "Wisa dixuye ku di hefteyê de rojek jî ne bitirkî ye. Tenê du heb "tesî" yê we hene. Îcar guh bidin me emê ji we re navên rojan bi kurdî bibêjin: "Şemî, yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, în." Dema tirkên me yên demokrat ev seh kirin bû niçe niça wan û kûr û hûr fikirîn, yekî got: Bi rastî jî di zimanê me de ji navê rojan tenê du hep "tesî" hene. Ez ji we lêborina xwe dixwazim. Min derziya di çavê we de didît lê gîsinê di çavên xwe de nedidît."

**Xalê Eloye Gavan/ Stenbol**

### TV-MED tava me ye

Mijokdaran Kurdistan kirin çar parçe û gelê kurd ji hev qetandin. Nexwestin gelê me baweriyê bi xwe bîne û bi yekîtî û serxwebûnê şabibe. Mijokdaran di nav gel de digotin: "Pêxemberan gotiye kurd serbixwe nabin û ji kurdan ewliya û serok dernayên." Bi wan gotinan jî dilê kurdan sor dikirin. Lê îro kurd bi tevgera azadiyê re nêzîkî serxwbûnê bûne. Cîhanê gelê kurd û têkoşîna wî nas kiriye û qîmetê didê. Kurd jî êdî xwedî rojname û parlemento ne. Bi TV'ya MED'ê re jî bûn xwedî name û televîzyonekê. Kurd wê bi TV'ya MED'ê xwe nas bikin, ji zimanê kurdî hez bikin, çanda bi pêş ve bibin. Bawer bikin dema mirov li wê temaşe dike mirov xwe serfiraz dibîne. Ez bawer im wê televizyona me ji me re bibe taveke pîroz. Û TV'ya me li me pîroz be.

**Azad Şêrîn/ Êlih**

### Faşîstî û demokratî

Salvegera 50 saliya serketina li dijî faşîzmê li her derê gerdûnê tê pîrozkirin. Ew zor û zilma ku Hîtler li gelê xwe û li dugelên cîranê xwe dikir, tev ji bo nîjada alman bûn. Hîtler nîjadperest bû ev nîjadperestiya wî kete nava rûpelên dîrokê. Îro gelê gerdûnê tev vê nîjadperestiya lanet dikin. Mijokdar û paşverû bi azîneyên kevin hew dikarin gel bixapînin. Ji ber vê yekê li gorî demê polîtîkayê nû dimeşînin. Rojev demokrasî û mafê mirovan e, mijokdar û xwînxwar li ser navê demokrasî û mafê mirovan neheqiyeke bêhempa dikin. Çiqas nirx û hebûna mirovahiyê hene dest danîne ser û li gorî berjewendiyên xwe bi kar tînin. Kelahê di hundir de dadigirin. Çillera çilmok jî govend li ku be, xwe li wê deverê dikişîne. Dixwaze wek hevalbendê xwe, ew jî bi vê govenda li dijî faşîzmê xwe paqij bike. Li Kurdistanê zarok, jinê ducan, keç û xortên ciwan tên kuştin, gund têne şewitandin, tevkujiyek bêhempa didome, berpirsiyarên van kiryaran kî ne? Çiller vî şerê qirêj tevî ji bo nîjada tirk dimeşîne. Çiller bi xwe nîjadperest e û heft pihîn li ser dilê Hîtler xistine. Bimînin di xweşiyê de

**M. Alî Mutlu/ Meletî**



www.arsivakurdi.org



JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

## Nameyên rexnegir

Di nav kar û barê derxistina rojnameyekê de nameyên ku ji xwendevanan tên pir girîng in. Her nameya ku ji navenda rojnameyê re tê şandin; rexnegir an jî pesindar, dibe sebep ku karên navendê baştir bimeşin. Hejmara nameyan û eleqeya xwendevanan çiqas zêde be, ewqas mirov karê xwe cidî dibîne û xwe ji kêmasî û çewtiyên karê xwe mesûl digire.

Helbet naverok, mesaj û qalîteya nameyan jî pir muhîm e. Her roj bi dehan nameyên bi kurdî ew çend jî nivîsên li ser mijarên çand, huner, siyaset û hwd. ji me re tên. Yanê, xwendevanên me ji bo ku rojnameya Welatê Me baştir derkeve tu car me bi tenê nahêlin. Bi vî awayî ev hewesa me ya ji bo xebatê zêdetir dikin û dilê me gur û geş dikin. Em ji ber vê hewldana wan, spasiya xwe pêşkêş dikin.

Piştî ku me pewistî û girîngiya van nameyan anî zimên, em werin ser rexneyên xwedevanan.

Her xwendevanek xwedî maf e ku rexneyan li me û kesên din bike. Ji xwe heta ji destê me tê em cih didin van rexneyan. Armanca me jî ew e ku em rojnameyê bikin platforma deng û dîtinên cihêreng. Tevî vê yekê, di hinek rexneyan de hin xwendevanên me yên ku li Ewrûpa rûdinin, sinorê rexneyan îhlal dikin, û me neçar dihêlin ku em nivîsên wan biguherînin an jî neweşînin.

Ew rexne ji aliyê fikir û baweriyan ve rast bin jî, ji aliyê uslûb ve nebaş in. Hindik bin jî hin xwendevanên me bi navê rexneyê êrîşî şexsiyeta çend nivîskar an jî siyasetvanên ku naecibînin, dikin û dijmînan ji wan re didin. Em rexneyên bi vî rengî rast nabînin û difikirin ku ew dibin sebebên nexweşiyan.

Tevî vê yekê heta ji destê me tê em rexneyên her kesî, piştî sansurkirina dijmînan, diweşînin. Feqet divê em bidin zanîn ku dîtina her xwendevan û rexnegirî aîdê xwediyê xwe ye. Rojnameya Welatê Me tenê navgînek e ji bo ku deng û nêrînên cihêreng di dilê însanên me de nemînin û bêne îfadekirin.

**Jerenot:** Xwendevanên me yên ji girtîgehê di nameyên xwe de hin pirtûk û weşanan ji me dixwazin. Mixabin ji ber bêimkaniyan heta niha me daxwazên wan neanîn cih. Em wisa hêvî dikin ku di rojên pêş de emê hin daxwazên wan tedarîk bikin. Silavên rojnameyê vê gavê em ji hemû girtiyên doza azadiyê re dişînin.

# Daxwaza Tirkiyeyê û rastiya dîrokî

Kî guh nede dengê demê, wê li dû zemên bimîne û kî rastiyan nebîne wê di nava xewn û xeyalan de bimîne. Bêyî siyaseteke dûrbîn û ramanên rast û bêyî rêberiyeke berpirsiyar, pirsgirêkên mezin ji holê ranabin û eger zû be an dereng be, her tim rû didin. Lewre bi înkarkirinê, bi guhnedanê, bi felsefeyên derewîn û bi darê zorê çare ji pirsgirêkên civakî, siyasî, olî, neteweyî û hwd. re nayê dîtin.

Dema gelên cîhanê ji bo azadî û serxwebûna neteweyî serî hildidan û xwîna xwe li dijî koledarî û zordariyê dirijandin, wê demê hîmê komara tirk li ser zordariya neteweyî hate danîn û hebûna gelên ne tirk hate înkarkirin. Ev felsefeya derewîn, heya îro jî berdewam e. Lê dema mirov lê temaşe dike, dibîne ku ka vê felsefeyê çi bi xwe re aniye.

Berî her tiştî di serê mirovê tirk de baweriyeke nîjadperest ya ji rastiyê dûr peyde bûye. Di vî warî de perwerde, xwendin, wêje, saziyên çandî, dîroknivîs, navgînên ragihandinê û heya mizgeft û ola îslamî jî, kirine xizmeta vê baweriya nîjadperest. Karbidestên tirk her amade bûn, ka vê nijadperestiyê bi zîndanan, bi darê zorê û bi xwînrijandinê biparêzin û bikin hevpeymana neteweyî ji bo tirkan. Di dawiya sedsala bîstan de, karbidestên tirk gavekê jî, ji vê siyasetê bi dûr neketine. Bi sedhezaran leşker, êrîşan dibin ser gelê kurd, li Bakur û li Başûr, xwînê dirijînin û dest diavêjin nirxên me yên neteweyî û gund û bajaran kavil dikin. Bêguman ev şerê qirêj û ev kirinên hovane bêbersiv namînin. Ji ber vê yekê û wekî encam, ji şerê taybetî û qirêj re îro dewleta tirk ketiye nava buhraneke kûr û piralî:

1– Mirovê kurd êdî bindestiyê napejirîne (qebûl nake) û serdariya tirkan ji ser xwe avêtiye. Bi gotineke din, êdî zincîra psîkolojî (nefsî) ya koledariyê hatiye qetandin. Roj bi roj jî gelê me têkoşîna xwe ya neteweyî bi pêş ve dibe û saziyên xwe ava dike.

2– Ne tenê rewşa gelê kurd dijwar bûye, jiyana gelê tirk jî bi tevahî ketiye bin bandor û encamên şerê taybet. Bi milyaran dolar ji bo çekan û leşkeran tên dayîn, û li aliyê din em dibînin ku nan bi dest mirovan nakeve û bi milyonan tirk ji welatê xwe derketine, ji bo kar û parsa aborî. Dewleta tirk êdî nikare mehaneya karmendên xwe bide û nûnerên wê li cîhanê tev digerin ji bo parskirina pereyan û standina alîkariyên diravî .

3– Cîhan tev dibîne, çawa mafên demokratî û mafên mirovan li Kurdistanê û li Tirkiyeyê têne perçiqandin û binpêkirin. Rojnamevan, nivîskar, endamên komeleyên mafên mirovan, rewşenbîrên azad û gelek mirovên din ên bêsûc têne kuştin.

Çapemeniya tirk û navgînên nûçevaniyê (radyo û televîzyon) bûne gustîlkên pêçiyên karbidestan, ew bi ku de dixwazin wan wê de badidin.

4– Dewleta tirk hêvî dike ku bi riya şer doza kurdî ji holê rake, lê dîsa cîhan tev dibîne, çawa ew ji ber lêdanên gerîla hêrs dibe û hîn bêhtir di heriyê de diçe. Ji sala 1984'an ve, gerîla dixwazin roj bi roj îsbat bikin ku gelê kurd heye. Ev jî bersiveke dîrokî ye ku dema şikandina şoreşa Kurdistanê li Agiriyê bi serokatiya Îhsan Nurî Paşa, tirkan bawer dikirin û digotin: "Muhayyel Kurdistan Burada Meftundur." (Kurdistana ku dihate xeyalkirin di vir de naştî ye).

5– Ji zû ve karbidestên tirk berê xwe didin Ewrûpayê û dixwazin bibin endamê bazara Ewrûpayê (berê) û Yekîtiya Ewrûpayê (niha); lê Ewrûpa karta sor nîşanî wan dide. Eger ji dil be an hucet be, ew mercan datîne pêşiya tirkan. Li gorî xwestina Ewrûpayê pêwist e Tirkiye mafên mirov û demokratiyê biparêze û çareyeke aştiyanê ji pirsa kurdî re bibîne.

6– Komara tirk wekî dûmahîka dewleta osmanî her tim xwestiye serdariyê li Rojhilata Navîn û herêma Balkanê bike û dewletên hewşê (cîran) têxe bin zora xwe. Ev xwestin û armanc di çarçoveyê siyaseta NATO û CENTO'yê de eşkere bûn. Bi endamtî û beşdarbûna xwe, di wan sazûman û peymanan de, Tirkiye rûyê xwe yê şerxwaz nîşan da û leşkerperestî û destdirêjî, bûn siyaseta dewleta tirk ya fermî. Bi vê şêweyê siyaseta hundirîn û ya derve hev û din temam dikin û bi hev re gav bi gav diçin. Eger destê tirkan bihata û karibûna, wê êrîş bibirana ser hemû dewletên hewşê; ji Yewnanîstanê bigire heya bi Ermenîstanê.

**Dr. GUNDÎ DILBERZ**


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 550.000 TL | ☐ 45 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 1.000.000 TL | ☐ 80 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.800.000 TL | ☐ 150 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..........................
**NAVNÎŞAN** : ..........................
..........................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 293 53 19 – 245 29 91



**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atina–** Ferhan Zêbarî
30-13634905
**Bruksel–** Medenî Ferho
32-16-49 07 67


www.arsivakurdi.org

Derhênerê fîlmên rengan (Şîn, Sor, Spî) sînemevanê bi navûdeng Krzysztof Kieslowski:

# SÎNEMA NE HUNER E



**Di dema niha de xurtbûn û serkeftin mode ne. Ji bo ku mirov xurt û serkeftî be, divê mirov xwe ji hemû dudilî û dilovaniyan rizgar bike. Dema te ev tişt kir jî, tu hemû hevalên xwe winda dikî. Qelsî ne mode ye, dilovanî ne mode ye. Ew tişt mirovan ber bi hev dibin.**

Karbidestê fîlmê Sê reng: Sor, Spî, Şîn û fîlmê Deh Ferman Krzysztof Kieslowski, bi van fîlmên xwe navûdeng daye. Karbidestê polonî Kieslowski, ew 25 sal in ku fîlmên belgeyî dikişîne. Ew di Kovara Newsweekê ya 15'ê gulanê de, li ser sînemayê û siyaseta dinyayê tiştên balkêş dibêje. Bi hêviya ku wê bala we bikişîne em qismekî ji vê hevpeyvînê li kurdî werdigerînin.

**Hema hema hemû xebatên we hin prensîbên rojavayî wekî; prensîbên dema Ronahiyê û Deh Fermanên încîlê, ji xwe re kirine mijar. Gelo peywira sînemayê û ya hunerê ew e ku nirxên kevneşopî ji nû ve şîrove bike û wan pêşkêş bike ?**

– Sînema hunere an na, ez ji vê ne em in im, lê heke ew huner be, ew jî dikare bibe yek ji fonksiyonên wê.

**Heke sînema ne huner e, gelo çi ye?**

– Sînema şêweyê herî basît ê çîrokbêjiyê ye. Mirovan tim xwestine çîrokan vebêjin û li wan guhdarî bikin. Bifikirin heke mirov bixwaze fîlmê hevokeke wekî, "Pêşî hatina xwe ya ji bo dîtina wê kêm kir, kêm kir, heta ku ew bi giştî birî." bikişînin, mirov nikare. Di wêjeyê de mirov kare wê bi çend peyvan bîne ziman. Ji ber ku ew qala pêvajoya demekê û têkiliyên du mirovan dike, heke mirov bixwaze vê hevokê bi riya fîlm ragihîne mirovan, divê mirov nîv seatê lê xerc bike.

**Heke wekî hunerekê sînema ewqas qels e, we çima karê fîlmê kişandinê bijart?**

– Min ew pîşe nebijart. Hema jixwe pêkhat, ez niha fîlman çêdikim ku bi mirovan re bikevim diyalogê. Ne bi komek mirov re, lê bi kesê ku tên dîtina fîlmê min re. Ez dixwazim pirsên ku min ji xwe kirine, temaşevanên min jî ji xwe bikin. Wekî: Çima divê ez bijîm, çima divê ez serê sibe hişyar bibim, çima divê ez bixebitim û piştî mirinê wê çi bibe? Ez dixwazim têmaşevanên min fêm bikin ku ew di tirsên xwe de, di şikên xwe de û di warê hesta ku mirov jiyanê bêkêr dibîne de ne bi tenê ne. Ev pirs pirî caran bêbersiv in. Tiştê ku bala van dikişîne jî ev e. Pirsên bêbersiv mirovan dixin nava hewla lêkolînê. Tiştê girîng lêkolîn e, ne bersiv e



Derhêner Kieslowski di fîlmên xwe de li ser pirsên bêbersiv disekine.

**Fîlmê we yê dawîn li biyanbûyînê (alienation) dikole. Gelo mirov di salên 1990'î de ji berê zêdetir tenêtiyê dikişînin?**

– Bi temamî erê. Welatek çiqas dewlemend be, nîştecihên wî ewqas zêde bi tenê dimînin. Min fîlmê xwe yê bi navê "Sor" li ser civaka swîsrî çêkiriye. Ji ber ku min tu car mirovên bi qasî yên swîstreyê îsole (ji hev qetandî) û tenê nedîtine. Li vî welatî rewşa aborî ya hemwelatiyan baş e, lê ew zehf bitenê ne. Li tu welatan min evqas mirovên ku dixwazin ji welatê xwe veqetin nedîtine.

**Derhêner Kieslowski xweserkeftî nabîne, li gorî wî serkeftin, pêkhatina daxwaza mirovan e. Ew dixwaze bi xwe re di nava aştiyê de be, lê ew tişt pêk nayê ango daxwaza wî nayê cih.**


**Li welatên rojava yên dewlemend, mirov ji yên li Polonyayê û welatên rojhilatê Ewrûpayê ku di bin destê împaratoriya Sovyetê de bûn, hîn zehftir bitenê ne?**

– Bêguman. Ji ber ku renc û pest mirovan ber bi hev dibe, dewlemendî û refaha madî mirovan ji hev vediqetîne. Di dema niha de xurtbûn û serkeftin mode ne. Ji bo ku mirov xurt û serkeftî be, divê mirov xwe ji hemû dudilî û dilovaniyan rizgar bike. Dema te ev tişt kir jî, tu hemû hevalên xwe winda dikî. Qelsî ne mode ye, dilovanî ne mode ye. Ev tişt mirovan ber bi hev dibin.

**Li Polonyaya komunîst, di bin rêveberiya leşkerî de we li dijî sansura hikûmetê şerekî dijwar kir.**

– Ez naxwazim peyva şer bi kar bînim. Peyva cambaziyê zêdetir li tevgerina sendroma poloniyan tê. Li Polonyayê me hez dikir ku em rencê bikişînin. Li xweşa me diçû ku em zehmetkêşiya xwe nîşanî dinyayê bidin. Bi me wisa dihat ku bi zehmetkêşiyê nirxa me ya mirovbûnê wê zêde bibe. Tiştê ku me nivîskar û fîlmçêkeran dikir, karê tevjiyîna bi sansurê re bû; xapandin, di dor re zivirîn û hwd. Ew ji bo me wekî pêşbaziya kaşûnê ( xwe li ser berfê şemitandin) bû û me wekî kaşûnbazan di nav kend û kospan re rê didîtîn ji xwe re. Ew ji bo me ezmûneke (tecrubeyeke) baş bû. Sansur jî wekî hemû tengasiyan kana îlhamê bû. Mirov hîn dibe ku ji sînorê xwe bibihure. Ez bawer dikim ku ji ber sansurê li rojhilatê Ewrûpayê gelek keşfên hunerî û rewşenbîrî pêk hatin.

WERGER: SAMÎ BERBANG




www.arsivakurd.org